

Nûbar

Wezîrê Nadirî

1935

Neşra hukumata Êrmenistanê Rewan- 1935

Tîpguhêzî ji Edo Makuyî

6/7/2011

15/4/1390

1935

89157

7

Nûbar

Têmûrê Xelîl Mûradov

2- Oy Pereulok Fûcîka

Dom 7, ku.8

Êrêvan- 375078- USSR

Tel. 35. 10. 20(mal)- 52. 97. 41(kar)

Neşra hukumata Êrmenistanê

Sêksya kitêbê kurmanca

Rewan 1935

538- 79

Nivîsandin bi tîpa latînî: Edo Makuyî

18/07/2011

Rêdaktorê Çavdar

Casimê Celîl

Temiz Kir W.Nadirî

Naşir N.3521, tembe 1286

Glavlît n. S25 tîraj 1000

Neşirxana hukumetê Rewan

Kûça Gnûnî I- mal N.4

Dilteqya

Ez çûme xirmana kolxozê, bêderê, li wê derê hazir bû uzvekî dinê, ew kal bûbû,
hatibû ber mirinê, berê, salada dîtibû gelek derdê dinê, ew kolxozê da bi dil, ceger
dixebitî, runişt, hilda devê xwe qelûna vêketî ji min ra qise dikir derdê buhurtî ewî
digot nolî merivekî di şewitî.

-Ax! Çi zû kal bûm,

Wax! Çi zû kalbûm,

Ji xebatê bê kêr bûm,

Ji hebûnê bê kar bûm,

Ez ji kalbûnê ker bûme,

Rû sipî, pişt xar bûme.

Ji derbiderîyê şûnda mame

Umrê buhurtî poşman bûme.

Ezê bêjim rojê min derbazkirî,

wekî tu seva halê min bigirî

Aqilê te şaş be, çevê te bibin tarî

çika dikarî bibînî çara vî agrî.

Niha dibêjim, yeko- yek,

Kesîb bûm, ez bûm çêlekek,

min yek jî qazanc kir, bi zorekê,

ez jî êdî bûme xudanê malekê

Min û jinê ji hev hizdikir,

Min biharê jin li yekê dikir,
Ya dine jî giran bar dikir,
Min jî koç ber bi zozanê dibir,
Ez jî diçûme zozanê,
Seva jin nemîne bê xarin
Ta nekeve, çev neyên girtinê
Belkî keda me hêsa bê xarin
Paşê bû kurekî min
Pey wî bû qîzeke din,
Nave qîzê Xanim,
Yê kur ezîzê min.
Kur ne şirîntir bû ji qîzê
Her du jî yek, cegerê dê û bavê,
Wekî min zanibya ji aranê
Wê bêne ber helaketa mirinê
Wekî çêlekek nemira
Ya dinê jî ku aqê bibira
Lap serê min bihata ber kêra
Dîsa minê ew şuxul nekira
Minê ava zozanê heram kira

Carek seva zarê xwe bikira.
Ne dibûme xulam tu cara
Zar nedihîştin birçî ber dîwara.
Ez tucara ne diçûme zozanê,
Seva du berx, 3 kar standinê
Minê bi paletîyê ew bidana xuey kirinê
Seva roja îro, vê birînê
Birîn eve, li min guhdar be,
Bi nêta xebera min agahdar be,
Halê min binîda bizan be,
Ku mirina min li te eyan be.
Mirinê kur qîzek û çêlekek bir,
Axakî çêlekek, aqê din heq bir,
kur çû, qîz çû paşê jî jin mir,
lê min ecêveke dine kir.
Çend meha şûnda dîsa bûm xulam
.Bi dilekî kul hevalara dikêlimyam,
sivê heta êvarê difikiryam,
lê ez li ser wî halî jî nemam.
Îja vî axayî ez lap xarandim,

pîrê jineke belengaz alandim,
jinik qîza birê wî mezin bû.
Qelenê wê xebata 5 sala bû.
Seva aqê dixebitîm bê rehetî,
Min ew dît ku bûme kalekî ketî
Min ne mal çêkir
Ne jî pakî derbazkir
Xuezila min li we roja we îroyîn bê
Hûn gihîştine wexta şêwrê vê meremê
Bûne xudanê keda xwe
Ax! Umrê çûyî nayê şûna xwe
Xuzil mirin hebe dinê da
Kalbûn- pîrbûn tunebe şêwrêda...
Ewî xebera xwe paşîn bi axîn kuta kir
Min ew dît ku çev girtin, îdî venekir.

Gundê meda

Êvarekê bi hewa xweş, bîna temiz
Bin îşîqa hîvê da berebûn mêr- jin
Pêş kopêratîvê, ber kullûbê
Cîkî xebatê dîtibûn û hatibûnê

Hinek dixebitîn ser çêkirina kanîyê
Hineka bi hevra xeberdida seva xulîyê
Wê lezê nişkêva nizanim ji kêderê
Emer destê Elî girt anî wê derê
Elî ; çima nayî nava kolxozê
Usa dimînî feqîr û belengaz ?
Were bive uzvê kolxozê
Wekî kareke giran jê bê
Ez navme uzvê kolxozê tucara
Sêx Lezgî tê mala me car- cara
Derheq kolxozê da divêje gilya ne
Wekî"qe ne laqî cibleta merîyane"
Şêx digot, 3 merî wê ji kolxozê bimirin
Fitra, zikatê nadin, loma pê digrin
Ji kolxozê jî tu qencî çê nave
Bi gotina xudê devê wanê zihave
Rojê em dixun tolma û lewaş
Ew jî dikin ber zikê xwe kewirê aş
Yê ku duxun kêf dikin ew em in
Ew in yê ku li ber sermê dilerzin

Kêf dikin ser karabata em mêr û jin
Te bigota hûn tewlê dewêrda dimirin
Herro xarina meye katlêt û qeyxane
Hûn li ber nanê tisî mazûl mane
Tenê carekê mala teda xarin hazirbû
Ne ew jî usa bû, wekî para te nemabû
Yê kolxoza me hene mî, mihîn
Helbe, çavê wan pak navîn ?
Nanê me bi maşîna te hazir kirin
Ne ew bi milla zevîyada dimrin
Ew nan serê xarinê hemû ye
Edî xapandina wan bergê çîye ?
Çîqa diçe xebata me hêsa dibe
Hûn ussa duxebitin mal li we xirab dibe
Tu çewa kesîb ezê te hîn kim
Seva rihetya canê te dibêjim
Wekî divînî lezet heye li kêderê
Çîma xwe nadî nav wê derê ?
Guh bide, binihêr ez tera çî dibêjim
Çewa ku ji sinifa te ? xirabîyê navêjim

Qe dive wekî ez buxum teamê
Tu jî buxî nanê tisî, ser dakî avê
Bese tî û birçî li besta razê
Sivê were erzê bide kolxozê
Çewa kesîb, biratî te şîret dikim
Her çi kulak, em ji kolxozê jî derdikin
Serwextvin li ser derbaz kirinê
Herçîku bûn şêx, melle guh nedinê
Çimku roja wane paşîn ewe
Loma ussa xwe dispêrine we
Herçîku wan sere me kir, em zanin
Derdê wan hela me danîn
Ewan şêx, mella û pîra em difrotin
Bi kapîtalîst û mikedara dişewtandin
Elo tu were ser xebera min
Bive uzvê kolxozê hevalê min
Hetta niha min şer dikir û digot
Çimku wekî dibû behs, şêx dil disot
Êdî min hêja îna kir herçî, ku te got
Ewî gilîyê teyî paşîn lap dilê min sot

Bîra min jî tê, wekî seva cêvê xûn dirêtin

Salê çend cara kesîb- kûsib dimêtin

Wekî nivîsarçî hebûya, minê binivîsya

Seva ketina kolxozê dilê minê hêsabya

Êdî gava şêx û melle gilîkî bibêjin

Em kesîbê caba wanda bibêjin

Bira undavin şêx, bûrjû, melle

Ewana lap welgerne ser kelle!

Ezê bivim uzvê kolxozê- mala tifaqê

Êdî tu cara em navine hewcî xelqê

Ez û kurê xwe emê pêra jî hînvîn sazê

Zef şa me wekî em gihîştin vê mirazê

Emer, tu min haya nevîne

Hela birê xwe sivê pak bibîne

Bostanê kolxozê çewa dike şîne ?

Pê çavê dijmina derdixîne

Kilama Elo

Bintara bêq, ber serê bostanê kolxozê

Dengê bilûra Elo mîna mîna dengê sazê

Tevî hewê hêdî- hêdî, qat- qat bilind dibû

Ewî ser qaydê bilûrê kilamek çêkiribû
Dengê bilûrê zîz dilê mêriv dihat
Bi wêra jî kilameke teze ha digot
Şivantîya me berê bi cefa û ne xweş bû
Berî firqa bolşêvîk dunya şeverêş bû
Xên ji şivantîyê axa ussa em didane xebatê
Xebat bû, me hazir fikir ruhê me dertê
Wextê axa sole xwe di pê kira
Gerekê me zûka derî lê vekira
Wê barê me ji dara barkira
Wekî dibû wextê standina heq
Axa li me dibû terazya neheq
Heqê me dibû şîlek du şemaq
Pêş wê va me distand fera toraq
Naka hatîye firqa bolşêvîka
Azayî daye hemû mexlûqa
Em jî dixun kêf dikin
Kûlak axa red dikin
Kolxozê da ez jî şivan Heso jî şivan
Em her du jî bûne bilûrvan

Li me hatîye xweş dewran
Emê hero bikin kêf û seyran
Em şivan, gavan, û berxvan birane
Ji ser me hemûya çûye bare girane
Me pirolêtara ser xwe avît nîre hesinî
Dewran hat lap li ser me sekinî
Em şivanê pezê kolxozêyî rindin
Êdî axa û beg ji me newêrin
Ji tirsê me xwe vedişêrin
Usa direvin piş xuya nanhêrin

Erza Şemê "Rîya teze" ra

"Rîya teze" eger li te zehmet be jî
Dîsa tu yî, ku minetê nakî ji kesî
Li halê min binihêr û li min bi pirsî
Her çewa heve, bike rehmê li min
Kesî tu murwet nekir li min
Zarbûm qewma û pizmama xapandim
Bi malê dinê ji kalekîra revandim
Umrê min gihîştibû neha hela zarbûm
Ji hebûn- tunebûna dinê bê xeberbûm

Rokê birê min, dîya min û bavê min
Çimku bûbû yê avîtinê kevirê min
Dest dane destê hev, kevirê min avîtin
Ji kalekîra bi peretî ez firotim
Her çiqasî ku ez ne çûm, min înkâr kir
Qirarê ku wan danîbû, min qebûl nekir
Lê min nikarîbû qirar daynim û bisekinim
Ax ! çima ji dinê xilas nebûm û ne mirim
Gilî kirin yek, bi zorê milêd min girê dan
Peretî ber bi mala kalê dînî çûn û pêşda dan
Hela binhêr, dame mêrekî çewa
Çar standîye, ez bûme jina pêncâ
Melle hazir bû li wêderê
Nikaha min birî kire devterê
Hewcî melê xapînok kirim
Dîsa yê mêrê min mal da hebûn
Sê çar jinê wî hela guh bide min
Hebûn sê kur, çar qîz, û dêke wî
Ez ku birim bû yanzde neferê wî
Her yekê gilîk tev gilîyê min kir

Her şev bare min ji dara bar kir
Ew çi mêrtî, jintî bû ez nizanim?
Hingî hatime vê malê rojê navînim
Biska venagirim por şe nakim
Surra xwe ji birê xwera jî navêjim
Çimku wana rastîyê qelpî tevkirin
Ez belengaz, nolî heywîn firotim
Na, bext reşîyêda tenê ez nînim
Bi hezara ber girî hene yê mîna min
Zef hene qîzê delale ussa bûyî
Lê kê mînin yê nolî mine êciz bûyî
Ez ne giryam, dame girî
Bi zêra dame kale ketî
Êvar ku tê dive şerê me
Mêrek û çar jin radivin, ber hev
Axirê kale mêrî me rabû ser piya
Bi dara usa lêda pişta me tewîya
Berî hemûya li min da, bûme sewdênî
Sivê heta êvarê kirme xênî
"Rîya Teze" qurbana nave te bim

Hela bêje, ezê heta kingê ha bim
Ax ! ez çi bûm belkî ez bibûyama însan
Heta kengê wa bimînîm giryan
Ez ricûyî kalê nexwendî kirim
Insaf û mirwet pêpez kirim.

MUHUBTI

Rojeke havînê ewravî li ser çîya
Li zozanê Egrîce nav belekîya
Berî êvarê wextê esir piştî nîvro
Pîskê baranê dihatin yeko- yeko
Paşê gur dibû
Dibû lêyl dikişîya
Dikete gelîya berjêr diçû
Heta gunda, nav zevîya
Wextê baran vedike
Erdê kulîlka şîn dike
Paşê tav dide, nermayê dikşîne
Pey wê tişteki kesk- sor dixuêne
Zaru divêjin
"keskesorê bibînîm,

Mişk û mara nebînim"
Paşê kevira ser sere xura davêjin
Ew hîn kirina mezinane,
Zef nêzîkî huba dilane,
Yek tiştê hiz ne kirî,
Ya din, evîna bi pera kirî,
Ew heva simandina bi zor,
Mîna dîtina mişk mare kor,
Lê her çi ya ku huba dilaye
Mîna dîtina keske sorê ye
Tiştê usa nav qîz xorta
Xuzil nivîskar dîsa bidîta
Helbet wî jî dîtîye, paşê nivîsîye
Hinekî nêzîkî dilê xundkara kirîye
Carna dîsa ji sere çîya
Mijî digirt heta rasta
Dîsa tîrênca roê dida banîya
Dikete hemû best û gelîya
Mîtina kulîlk radibûn
Xwe dihejandin sipî- sor dibûn

Dengê ava , çema kanîya
Meriv lê muteheyêr dima
Piştî baranê nav kurmanca
Qîz, bûk diçûne ser çema – ava
Kinc, cil, ber,emenî dişûştin
Paşê ser kendalê avê radixistin
Hinek jî qîz- bûkê delal, her gava
Diçûne ser çema ber kanîya
Govend digirtin, dilîstin
Laqirdê dikirin, dikenyan
Nav wanda qîzek heye
Nave wê Balaxanim
Çeve reşin, sûreta nizanîm
Sîngê dûze, mîna berîyê
Çeve gir mîna du gola
Gola Wanê û sêwanê
Ewê hêsir dibarandin
Mîna ewrê av ji behra hildayî
Ussa dilê bi şewat û kelîyayî
Ew kesîbyê da mezin bûye

Dê û bavê

Pîrkê û xatîyê

Evîna wê jê standine

Bi zêre zer firotine

Êdî laqirdîya nake

Bi eşqa dil şa nabe

Tev hevala xwe kaw nake

Çeva kil nake, por venagire

Xwe ji her kesî vedigire

Kivşe,

Derdê wê,

Kula wê,

Meraza wê, evîne, hebandine,

Gerekê bihebîne,

Paşê dil şabe, çav bibîne

Berê ewlin nav qîz- xorta

Derheq hezkirin û hebandina

Edet bû nav kurmanca

Qîz nedidan tu mileta

Xorta, kura, lawika

Ne hebanda ji:

Êrmenîya, tirka û ûrisa

Li ser gotina dîn peresta

Ev hemû berdilê Balaxanimê

Zûda hatibûn cêbandinê

Ewê hemû jî pêpez kir

Dil heband paşê mêr kir

Ewê derbaz kirina iletê hişt

Bi zêra zîva standîyê xwe berda

Bi dilê hebandî dît, mirazê xuera gihîşt ?

Kilama oktîyabrîka

Zivistan çû, bihar hat

Erd reş bû berf hilat

Can hevalno bicivin

Em govendekê bigirin

Can hevalno bicivin

Em govendekê bigirin

Em zûrîyeta oktyabrê ne

Ewledê xebatkara ne

Can hevalno bilîzin

Gul û sosina biçinin

Can hevalno bilîzin

Gul û sosina biçinin

Can hevalno dest bidin

Emrê teze em çêkin

Welatê me yê şêwrê ye

Wetenê pirolêtarê dine ye

Welatê me yê şêwrê ye

Wetenê pirolêtarê dinêye

Dinya kevn em tezekin

Dinya teze em çêkin

Welatê me şên bûye

Kolxozê têda çê bûye

Welatê me şên bûye

Kolxozê têda çê bûye

Can hevalno mezin bin

Cêrga komsomola em zêdekin

Dunya me ye, ya me ye

Heta hetaye ya me ye

Dunya me ye, ya me ye

Heta hetaye ya me ye

Ecêve

Rojeke ewravî- dûmane, bi şilî ye, melûl

Baran dibarî, av cîyê çelik da dibû gol

Nav mala da mî û bizinê jare mayî

Mîna qûlê nexueşe madana da birçîbûyî

Xwe bin hêsîyê konara dikirin, hebin, diavîtin

Xueya- yehe, kîse bidar û kevira lê dixistin

Mêra merr hildabûn cewik dikolan av nedihîştin

Jina mêkut girtibûn, him- him sing dikutan

Ji alîyê rohilatê bîna bê hêdî- hêdî dihat

Bû çeveres, ew dûman bû, ku ser obê da girt

Li zozana Aqmiqanê- ware herî jorin

Heta payîza derengî belekîyê berfê ranavin

Li orta Qeredaq û Zeynelbatanê, Çaylaxê

Û çiyayê fêza Qanlî golê, kêleka Korbûlaxê

Rîya rêwîya têra nabe heta meha hezîranê

Ji dest berf, bager, sur serma û dûmanê

Hema wê roja barane- hewa sare bi dûman

Berx, pez û naxir li dora obê diman

Ji obê yekî- oro, Celal were van mî û bizina bive

Şivan heta ku heywanê nav mala derxe bive

Mecîdê Ûsivî panzde salî şagirt pêra çû

Pez birne Qeredaq ser çîyê Koroqlîyê

Baranê vekir ew li ser çîyê rûniştin, qilincîn

Mecîd: Celal, ew çî dare, ku sere vî çiyayîyî?

Ha erdê da kutayî, kî zane, çend sale maye

Celal: dibêjin ew singe hespê Egîtê birê

Kor Oqlîylê qaçaxe, ku heta naka maye li vêderê

Divêjin ewî xelq dişêland, talan dikir

Ji dera dianî, virada berav dikir

Çela sere vî çiyayî bona wî û Egîtê wî

Çîyê kela bûye, mîna mala wî

Pezê ji serma ricifî xwe dadiwaşand

Erdê hêşîn çeryayî, niha dikaya û dimehand

Tare dabû ser, her alî kulîlkê rengîn in

Mecîd û Celal erdê dora xwe nolî xalîça dibînin

Mecîd: Celal bêje, li vira dîsa çîyê usa hene

Ku Kor Oqlî têda maye, nolî vira ne?

Celal :- hinda kela Şemo jî hene şikevtê kûr

Ku jê derxistine perê çerm û hestûyê hûr
Wekî usane, li vira meriv kuştine, Mecîd pirsî
Wekî usane xelqê zozanê hemû ji wî ditirsin ?
Te xwendîye, tu zanî Mecîd can
Bêje çika çewa kirne ji wan ?
Ku usa bi carekê ew ji ortê rabûn
Erdê û esman wa ji wan aza bûn ?
Mecîd: wana gelek zulmê usa kirin
Xelq talan kirin, meriv kuştin zor kirin
Gundî û pale ji kirinê wan îdî aciz bûn
Hergav bi serkarîya Lênîn miqabilî wan dibûn
Dikirin îngilab şer dikirin
Dewa roja ha nolî îro, aza dikirin
Axir,- axrîyê rojê azayê hatin
Bere- bere kulak, zulumkar hilatin
Ewana him direvîn, him diketin
Kesîb, pale qe ber wan nediketin
Pirolêtaryata gotin- ravin gelî qelpa
Paşê zulumkar yeko- yeko dane bin lepa
Unda bûn şêx melle û zulumkar

Li dewse rûniştin pirolêtar
Xastina pala û gundîya hate sêrî
Zalim- zulumkar çûne ber dêrî
Dîwana xûnxura ji ortê hilat
Azayî, hevaltî û biratîya delal hat
Çev pirolêtara diketin, tijî xûn
Û zulum dibûn şewitandin bûn fikra wan
Nêta wan xûnxarin bûn
Fikra wan xelq talankirin bû
Ew kesê ku milk- maş zevt kiribûn
Koka wane pîs li her dera hebûn
Qanûn însaf ji bo wan tunebûn
Ax! Çi pak kok li wana redbûn
Ew destê ku ser xelqêda dihejiyan
Êdî nayê dîtîne mayîne wan
Gelo çima? Usa unda bûn
Qe êdî bi carekêva ranebûn?
Helbet, wê nikarvin ravîn
Tu cara ser xelqê li ba nevin
Pirolêtara li wan kirin firset

Ew red kirin, azatî anîne dest

Pîyonêr!

Gundê meda mekteb vebûye

Eşqa zarê gund zef pir bûye

Rojeke biharê germ delal

Ez ji têxnîkûmê diçûme mal

Ez çûm nêzîkî mekteba gundê bûm

Hema nişkêva ecêvmayî û şaş bûm

Dengê saza dersdar dilê meriv disot

Qîz- kura kilameke wa bihevra digot

Em zar

Ê 9-10 salî diçin dixûnin

Ulm û xwendinê dest tînin

Emê gotina Lênîn bicî bînin

Em dixûnin û Lênînvana in

Em hemû xûşk- biran in

Roja îro jî eme xuedan dewran in

Em dixûnin û bûne pîyonêr

Me daye ser millê xwe bayraxa sor

Emê berekêva derbazvine jor

Em pîyonêrê her dera
Civiane li vandra
Bi hevra bûne xûşk- bira
Dilê meda tune tu qelpî
Emê bivine hîmê sosyalîzmêyî lapî
Ancax em aza bûn ji wî kapî
Em pîyonêr pêdikin sola
Xwe diguhêzine dewsa komsomola
Guh nadine qanûna bav û kala
Dereca me pîyonêra zef jore
Nîşana me dezmalala sore
Aqilê meyî zef, fikra me kûr e
Pîyonêrtî komeke, tifaqe
Nav meda herro kêf û eşqe
Sêx Emo me divîne diteqe
Xeberê me teze hemû mizgîn in
Royê dem dezgehekî teze divîn in
Her tişteki hîn bûnekê jê hiltîn in
Xweş bimînin pîyonêr !
Sax bimînin pîyonêr !

Ser çava bê n wabî xêr...

Berê axa û bege zor bûn

Çaxê kommûnîst rabûn, ew korbûn

Kommûnîsta qeland koka zulimkara

Ew rakirin ji ser milk û mala

Çaxê axa dihatin ji derda

Tarîqa 17- a ewê ji dilê me xeberda

Milê meyî girêdayî berda

Me ne lazime îdî qet

Em dixwazin canê saq- silamet

Rîya rastîyê û fire li ber me ket

Em hemû jî hîn dibin ulm, terbyet

Axa û şêx bira dûr herin

Herin pêş xwe va venegerin

Me ne lazim in ewana

Ew zulimkar û xûnxurana

Ewana digirtin gelek şivan

Zarê wan jî dikirin berxvan

Kuta bûna salê tişt nedidanê

Bê heq- bê miz berdidanê

Çaqirbegêda

Gundê ku em lê diman, welatê Romê li ber devê gola Wanê bû. Gundê zûda bû. Kewşenê gunda da gellek karêzê avê yê ku anîbûn nav gund kiribûn kanyê lûlekîrî û derxistibûn. Mêrg, çîman, baq, û çend heb jî golê bi dest çêkirî hebûn, li ber wan gola çend heb aşê 3-4 çevî dixebitîn. Fêza gund, alîyê koşka aqê kelefekî aşê bê hebû, wekî berê bi qeweta bê ji mala aqê ra hatibû xebatê.

Gund da, gelek jêmayînêd fîdala jî mabûn. Kela kevirî, gemîyêd mezine li ser behrê rizîyayî sekinî, mabûn. Hemû yê ku bi destê gundîyê xebatkar bi qayêdê bêgara aqê hatibûn çêkirinê, çêkirina wan, wekî xebata gelek- gelek pale dixwest.

Lê eyan bû, wekî ji wan zeftir jî kesîb, çimku raste, nav gund da xan- manê bilind, tewlê mezin, hesarê fire, kadînê dirêj hebûn. Lê xanîyê koxtikî, tewlê çûk, nolanî koxtikê mirîşka du cara qasî wan bûn, yê ussa jî hebûn, wekî merîya nikarbû têda rave ser pîya.

Hetta kevirê merzela jî di gund da hebûna du sinifa dida eyan kirinê.

Nav merzel da hebûn qebir, yê ku ser kêlekê wane neqîşandî, dora wane hesar kirî û li ser wan kumbeze çêkirîbûn, hune qibir jî hebûn, ku kevirê kevirê serkêlekê wane ketî, dorê wane vekirî, tirbe hilşiyayî heywan ser ra diçû, dihat.

Bîra min tê, wekî nav merzel, ber qebra aqê gundê berê, Hesen begê millî dareke gûzê hebû, gundîya wî çaxî jê ra digotin, "Dara Maşûr" ew dar ji bona gundê me zîyareteke kivş bû, wekî her sond û înakirina wan bi wê bû. Çewa ku zîyaret her kesekî hindava xwe da miqatî ji darê dikir : xwelîyê bi fosfor vala dikirin dora wê û ardidan. Ji wê xweyîkirinê jî darê zef mezin û her belgeki wê weke destmaleke ser desta bûbû. Belgê wê kevn û teze ketibûn ser hev û binda weke ardûyê sê malayî zivistanekê darê kevn hebûn. Bi gotina rûspîyêd gund" kê darê wê bişewtanda, bişkênanda, waymîş nedibû, û ber pîyê xwe nedît, lema jî kesî taqet

nedikir û ser darê da nediçû. Gava ku Hesên beg kurê Eyub begê, dîya wî ji mala şêx Dewrêş bîye : wê malê jî, marê çolê girtine, anîne mal, hînê qayde- qanûna kirine.

Gund da beg bi xwe jî merivekî "zef adil bîye, wekî gund da yê ku dest dirêjayî kirîye, yanî tiştêkî yekî birîye, Hesên begê dest xwe ra emrî ser xulama kirîye, mala wî talan kirine, ew kuştine û kulfeta wî jê stendîye, firotîye yekî din, "lema çaxê mirîye, li ser qebra wî şev 3-4 cara çira vêketîye û salekê şûnda dara gûzê şîn bîye.

Raste wî çaxê ez zar, li ber berxa bûm, lê zarekî wa êgin, li ser xwe bûm, derheq wê darê da ez gelekî duşurmîş dibûm, min fikir dikir, wekî ew dar çima wê derê şîn bîye, çira çima? Gerekê ese li ser qebra Hesên begê vêkeve! Lê çima li ser qebra sofî Rizgo vêneket, wekî salê sê cara peya diçû hecê û parî nan jî mala xwe da rehetî nedixar, şev roj "ella ekber" digot û nimêj dikir. Wekî min ev carna hevalêd xwe berxvan ra digot, ussa qêmîşî min nedikirin, wekî min bikutin, çêrî min bikin, lê digotin: tu hela piçûkî guneyî , çî te pê ketîye, wekî tiştê ussa tînî ser zarê xwe, helbet ew jî raste, wekî ewqa pîne pêva hene, ew mezin- rûsipî hurmeta wê digrin.....

Lê ez nedisekinîm min ese dixast, wekî zanibûya, çika çima ussane.

Pir- hindik min zanibû, wekî Hesên beg ne merivekî adil bîye jî, her kê çiravêketin rast ve jî. Bi gotina mezina gerekê li ser tirba merivê pak, nandayî, birehm vêketa" dara zîyaretê ser wî şîn nebûya, ewî ku gelek zulm kirîye, bav û birakî min jî kirîye qurbana sîya wê dara ser xwe.

Lê min xwe pakî nizanibû. Min ji geleka pirs dikir, lê kesekî tarîxa darê ji min ra nedigot. Rojekê min fikir kir, wekî ji mala Arif begê pêştir, tu kes tarîxa darê nizane, çimku her kesî bi fêla xwe beledê, ewe ji wê male ne, wî çaxê ez diçûm ber

berxa û rind jî hînî çêkirina holerîsîn û kevirkanîya bûbûm, min kevirkanî û hole rind çê dikir. Kurê Arif begêyî ortê, wekî, wekî ancax 12- 13 salî hebû, ewî ji destkirê min zef hiz dikir.

Çimku min baskê kevirkanîya qalim û mêrkî dihûna, seva kevirêd giran hilde bavêje û dereng biqete, hemîn ku holêd min jî, reng- rengî û vereşandina wan tunebûn. Ewî zef dixwast ji wan holêd min yekê dest xe û hînî çêkirina kevirkanîya be, yê nolanî kevirkanîyê min çêke. seva wê yekê jî min berxêd xwe kuda dibir, ew jî pey min dihat.

Çewa hercar dîsa ussa.

Carekê, min berxêd xwe birin ber qeya zinêr dane meqel, wekî dara Maşûr jî meva xûya dikir, kurê Arif begê hat cem min rûnişt, xast wekî ez wî hînî çêkirina kevirkanîya bikim.

Lê vê care, min nexwest, wekî hînkim, min got:- kingê te serhatîya dara Maşûr min ra şiro kir, wekî ew çewa? Bi çi formê şîn bûye û çira çima ser tirba Hesên begê vêketîye, ezê paşê te rind hînî kevirkanîya bikim. Piştî gelek gilî û gotina ku min gellek tişt mayîn pêra gotin kirin.

Ewî fikir kir, çend deqa şûnda got...

Ezê rast bêjim lê gerekê tu holekê û kevirkanîkî bidî min û min jî rind hîn bikî û ji kesekîra nevêjî.- birabe, min got, - de sond buxe,

Min bi qebra bavê xwe û gilyê mayîn da îna kirinê. Ya darê û çira ser tirba Hesên begê ez pak nizanim, lê pêrar, wextê kakê minî Cemal beg jî mir, dîya min û bavê min dizîkava dikirin piste- pist û digotin,- piştî defîn kirina meyt, gerekê yek ji me 3- 4 şeva şeva dizîkava çirayê bive ser qebra wî vêxe û bitemrîne, heyfa Cemal begê nine, ku nav mezelê gundîyada bê rûmet be, nava wan.

Ji wê jî ez dizanim, wekî ya Hesên begê jî ussa kirine, paşê birine wê derêda kirine çal û mezin kirine, lê gerekê tu ji kesekî ra nevejî: dixwazî herim ji wê darê çend çîqa bişkênim em bişewtînin, qe tiştêkî jî bi me nake, min gelek cara caribandîye.

Min wî çaxî îna kir û hinekî bîna min hate ber min, wekî îdî derheq zambûna wêda, min tu fikir ne dikir, tenê dereq çewa gundî xapandina wanda duşurmîş dibûm...

Gundê me, ne gundekî nolanî wan gundê dine: Norevansê, Alekoyê Canîkê û yê mayîn bû. Gundê meda gelek tişt qewimî bûn, gelek qezya bûbûn. Niha hûnê bêjin çîka gundê xwe dipesine, lê na, ez jî mîna we, çewa ku ne merivê wî gundî ez jî teze mezin bûbûm, lê wekî meriv tiştêkî dît, gerekê bêje, ew jî tiştê wa, ku êpece xerîb û şuxulê qewimî...

Wî gundê meda wekî pir hindik şuxulê mîxanîktîyê hebûya, bawer bike, wê şûna şeherekî bigirta ussa mezin, têda gelek cimaet û cîyê wî pakbû, nav golê pêşberî gund jî çend adê êpece mezin hebûn, wekî divêjim gol, dive ku hûn bêjin, çîka çewa golê wekî ade têda hebûne. Ew gola Wanêye, wekî merivê wê derê jêra divêjin, bera Wanê.

Fêza gund alîyê aşê bê û gola dorhesarkirî avayêd mala Hesên begê bûn, pêşberî avayê Hesên begê jî kelefekî xerave, yê ku zûda hatibû şewitandinê, ancax şûna hîmê wî û cîyê bixêrîya xûya dikir. Me cahilê gund ew der seva holê û lîstikêd din kiribûn meydan her sive ji taştê şunda lê berev dibûn, hinek gasêtek, hinek kevivirîk û hinek jî li ser kevirê pîyê bixêrîyê tame û nehberk dilîstin, ew jî nolanî avayê mala me avaye, wê derê jî meriv jîne, û kulfet têda hebûne, qe kesek jî seva wê yekê nedifikirî û nedixastin, wekî zanibin jî. Lê ne ussa bû. Ew jî cîyê avaya, mala, kulfeta bû, ezê niha bêjim hûnê zanibin, çîka çî li serê wê male qewimîye? Çîma ussa buye. Çend sal ketibûn ortê.

Ez êdî êpêce mezin bûbûm, kirîn- firotana malê ketibû stûyê min. dîya min jî pîr bûbû, nikaribû rabûya- rûništa, ancax radibû, me cîyê wê çêdikir, û dîsa diket nav cîya, her- ro mirina xwe dixwest, lê hela ku mirin tunebû wextê wê nehatibû.

Ya rast bêjim, min dixast bizewcîyama. Dilê min jî qîza mîrzeda hebû, hemîn ku keçikê jî ez hebandibûm, keçik zef bedew navê wê Têllî bû. Seva jîrtîya min Mîrze jî ji min hiz dikir seva zewaca min cahilê desta bega ernûsî ji min dikirin, dixastin min telfkin, yanî ecêvekê bînin serê min, lema jî min nikaribû, hêsa bizewicîyama. Ez hatim bal dêya xwe û min ew jêra got, wekî cahilê bega ha dikin sere min.

Ew rabû ser xwe û mîna meriveke dîn destê xwe li çoka xwe xist, girîya û got:

Dûr here- dûr here, lawo, paşê got:

-wê roja birayê te bînine sere te jî, dîsa ocaxê me kor bikin.

Çima birayê min seva çi kuştin? Çi bûye dayê can, dayê!?

-tu wî kelefî, cîyê ku hûn lê hol dilîzin, nas dikî? Te ew gemîyê ser golê sekinî dîtine? De guh bide, ezê bêjim.

Ew kelefe, avayê Hamê Evdo bûye. Ew kurapê bavê te bû. Hamê merivekî kesîb hersal dibû gavanê gund û evarê jî ber destê mala Hesên begê dixevitî. Qîzeke Hamê zef bedew, navê wê Eysan hebû. Birê teyî mezin yê ku ez hergav şevê digrîm û em gora wî sond dixun- Efendî li wê begê bû, dîsa nolanî te niha, cahilê desta bega peyî ketibûn, dixastin ecêvekê bînin sêrî, axirê jî anîn...

Me qîzek ji Efendîra teze nîşanî kiribû, wana ku ji hesava der ji hev hezdikirin : seva wê yekê jî me nedihîşt ji mal derkevin, wekî cahilê mala beg bi zorê nevin û me jî nekujin.

Çewa her car, carekê jî dîsa ussa, Hesên begê gişk berev kirin" seva vedana binê golê û temiz kirina cewêd aşê xwe, hatin Efendî jî birin. Wexta ku Efendî ji mal

derketibû berbi xevatê çûbû. Cahilêd mala beg çûbûn pêşîyê, bi qema û şûra pirtî-
pirtî kiribûn, avîtibûn erqa avê.

Pey wê em malxirav bûn û çûn, malêda ez man kal û pîrek, hingê hela tu tunebûyî.
Êh, meyê çi bikira zora me nedigihîştê, tiştê ji destê me nedihat, cahilê mala beg
dixastin, wekî qîzik bi destê zorê ji mala bavê derxistana û bibirana , lê qîzkê û
bavê nedixastin, digotin : ew gilî wî çaxî wê bibe, çîçax ku em ji nolanî Efendî
bêne pirtî- pirtî kirin. Heta ku eme saxin tu cara ew şuxul nayê sêrî, seva wê yekê jî
şevêkê cahilê mala beg çend hev cahilê gund hildidin, tèn ser mala Hamêda digrin,
wekî Eysanê seva Elî begê, bivin. Wexta millê keçikê digrin, dikişînin : keçik dike
qûjîn, bavê wê pê dihese û radive. Hamê wekî gelek- gelek tiştê usa dîtibû û derbaz
kiribû.

Lê vê carê îdî teyax nekir, kire gazî û got, gelî xûnxura her çi we kir bese, ji mala
min derên kuştina Efendî ji we re maye, bese, tenê ji mala min derên. Serkarê wan
birayê Elî begêyî mezin yê ku Efendî bi destê wî hatibû kuştin, hers bûbû, gotibû lê
me Efendî seva çi kuşt ? xu dilê me neketibû xezna Efendî, ewî nikaribû rabûya
pêşîya me xeberda, ne me seva vê qîzê kuşt, gerekê em wê jî bivin.

Hema wî çaxî destê Hamêda darekî qalim, ew jî çomaqê wî gavanîyê bû, wekî
bextra ketibû dest, dagerande serê Elî ew derbêra ket,... A ...ha- malik şewitî Elî
ket, komê gotibû û pirtê – pirtê ketibû nav wan û revîyabûn, Hamê ji ser Elî
ranebûbû ew bi dara mest kiribû.

-lawo, de wê wextê jî sîlah- tiving, qirme û yê mayîn tune bûn, tenê şûr qeme, ew jî
tenê destê bega, axa û merivê dewletîda peyda dibûn.

Gava ku ewana direvin " derheq kuştina Elî da elametîyê didine Hesên begê, hema
wê gave beg radive, êgir berî xênî dide, bi kulfet va dişewtîne, ji wê mala ku 7

nefer bûn, tenê Eysanê ji nav êgir derdixin û divin, yê mayîn hemû nav êgirda dişewitin, dibin rijî.

-dûr here, ewna cîyê gelek malê nola me kirine cîyê lîstika top û lîstikê cahila, wê mala me jî xirav kin, dûr here, dûr here, lawo...

Inkê bêje, çika ew gemî çima ussa li ser behrê rizyane, mane, min got.

Cîyê min rastke, delalê dilê dayîka xwe , got,... Êdî ji hal ketibû, ancax xeber dida.

Min cîyê wê çêkir û destê xwe danî ber serê wê, ewê bi halekî çetin dest bi gotinê kir:- Êh, lawo wê jî bîra Eysê biçûya! , kuştina destgirtî û 7 neferê mala wan, wekî dê, bavê wê jî navda bi destê wan hatibûn kuştinê.

Of, nikarim bêjim, nikarim, çetine...

Daykê can, daykê, bêje, te îro lap ez helandim. Hela bêje, çika ez bi her tiştî bihesim, belkî karibim xwe ji wan xweyî kim.

Çend sal derbaz bûn. Hemîn ku Eysê jî biribûn dabûn kamil begê birayê Elî begêyî dine, yê çûk.

Ew gemîyê li ser golê rizîyayî, yê mala Hesen begê ne, ji Wanê tiştê arzan dibirine, Erdîşê û ji wê jî dianîne Wanê. Bi kulûra pere berev dikirin. Merivê mala wan hemûye dîne harê kêflî bûn. Ji wana kê zanibû pere çî ne, hergav bi gemîya diçûne adê nav behrê: seyrangê, gerê masî digirtin û digerîyan. Carna jî diçûn 4- 5 roja bi kulfetî ada Tewledêrêda diman qet nedihatin, çima çî wan tunebû? Dixarin, vedixarin, kêf dikirin, carê dora begekî bû, vê cara paşîn jî dora Kamil begê bû, gerekê ew bi kulfeta xwe va biçûya gerê, kêf bikira. Hemîn ku kêfa wan jî li ser gemîya û nav adê behrêda dibû.

Çewa pêşê rojê, dîsa usa, pez serjê kiribûn samuwar, û xurekê lazimî hilda bûn, Kamil , Eysê û jina Kamile dine, birêketibûn, bi gemîya çûbûne ada Tewlederê.

Li wêderê da çend roja xaribûn, vexaribûn, dîsa Kamil ji Eysêra dabû xebera, gele xeberê nepak dê û bavê wê ra gotibû, piştî wê, ketibûne gemîyê û gemî avîtibûne ser behrê, wekî bêne gund. Go – rêva behrê pêl vedida, av li hev diket, zer û şîn dikir, gemî bere – bere nêzîkî gund, qiraxê behrê, cîyê ku dê û bavê Eysê piştî şewitandinê avîtibûnê dibû.

Hemîn ku dara maşûr, û gola aşa jî xûya dikin, ew qehra avê, ya ku pirtîkê destgirtîyê wêyî Efendî jî ketibûnê tê kivşê, wî çaxî nav behrê, di gemîyê da Kamil begê jî- dîsa bi gemîvanê, heşîş kişandine, kêf kirine. Çaxê ku Kamil beg radive, wekî nava gemîyêda bilîze, diçe- tê, hema wî çaxî, Eysê defekê dide wî û gemîçiyê mezin, û divêje –"bira ev jî bibe elametîya nîşana usyanekê".

Gemî reşkirî bi şîn- girî tîn digihîjine malê. Êdî ewe, wekî gemîyê mala Hesên begê li ser rûyê gola Wanê dixebitin, xebata wan ew bû, Êdî piştî Kamil begê xebitîn.

Dayê can, dayê! Lê Eysê nekuştin? Min pirs kir. Ewê destê min li ber serî, hela gilî dêvda çevê xwe girt, êdî venekir...

Ji wê şunda çavê min hilnedihat ku li bega şêxa û mella binhêrim.

Pey mirina dêya min ra, min dixast ez ji gund birevyama. Lê gundê me Çaqirbeg heyf nînbû?

Yek jî destê min ji Têllîyê nedibû, minê çewa Têllî bihişta, nedibû, minê çewa Têllî bihişta, biçûma, ne begayê ew bibirana? Reva mine pêşînbû.

Min çi qasî dixast bimînîm, lê nedibû.

Min bixasta- nexasta gerekê birevîyama, yanê na, bi meytê min jî bendê erqê avê wê bihata girtinê. Ez seva reva xwe gelekî difikirîm. Lê ezê kuda biçûma, xweyî xudanê min kî bûn?

Gund da êdî ebûra min nedibû, mala meda jî kesek nemabû, Têllî jî ji tirsî wana nikaribû guhdarîya min bikira... lê minê Êdî çî bikira?

Şevêkê bin şevêva ez ji gund derketim, min berê xwe da berbi qeya Amokê. Ew rîya du roja ji gundê me dûr, orta gundê Xecîckê û Amokêda, li ber devê golê bû.

Qeyakê bilinde ussa bû, ku ji alîyê rê dernedikete ser wê, tenê ji alîyê golê pêpelingek danîbûn û ji wê wêda kevir nolanî cîyî linga vedabûn têra hildikişîyan, diçûn, dihatin. Li ser, dora wê hesarkirî, mîna kelayê berê navda curnekî avêyî mezin hebû. Wî çaxî gundîya ew der kiribûn zîyaret, digotin giva ku wexta pûtperesta da" eshabekî serê wî hatîye jêkirin(şêrda) serê xwe hidaye hatîye wêderê şehîd ketîye,. Ew cîyê kevirayî vedayî jî, cîyê destê wî ne, ku lê daye, kevir nolanî penêr mam, lê ebûra min ji dest zîyaretvanîya nedibû. Ewana kerîyê pez dianîn binetara wê didane meqel, hinek hildikişîyane ser zîyaratê, hineka jî newêrbûn diman li jêrê, xarin çêdikirin. Min jî xwe dabû ber hesarê bin pelekî da rûniştibûm, seva min nevînin. Êh , ussa jî nav, hero wa li çola, tî birçî nolanî merivê beyanî. Xevat lazime ji bona azabûnê, min got û idî nolanî ji cane xwe derbaz bûya, min dest bi xevatê kir. Ez êdî nêzîkî zîyaretçîya dibûm, min bi wanra bi forma zîyaretvanekî xeberdida, û carnajî derheq gundê me û Têllîyê ji wan dipirsî, gilî dianî ser zulma Hesên begê, wekî anîbû serê kesîbê gund , xeberdida.

Min ji zîyaretvanîya derheq li Rewanê teşkîlbûna teşkîlata xebatçîya ku miqabilî axa, beganê jî bihîst. Yek jî min bihîst, wekî çar hev kesîb li şêherê Wanê hatine girtin û gullekirin. Dîsa bi fesadîya axa ji wê jî ez rabûm bi qilixê belengaza hatime gund, bi rojê min û Têllîyê me hev dît, û gilî kire yek, wekî êvarê Arif begê jî bikujin û ji wê jî birevin herine welatekî din, têkevne nav teşkîlata pala bi wanra jî bixebitin, bona azaya xwe.

Êvar bû gundî steqirî, tenê dengê qûje- qûja rûvîkî dihat, ku sancûyî bûbû, hatibû fêza gund dikire zûke- zûk, se pê direyan, ewte- ewta wan bû.

Me dil û cegerê xwe tev anî û em berbî mala beg çûn, dest min da jî tenê kêrek hebû, lê Têllî destê vala nînbû, ewê baltê bavê xweyî tûj hildabû. Em pêra gihîştin. Her bûyîna bîra min tê, min dît. Ku Têllî ber stûya kirasê diqelêşe û malda jî xire-xir, merî dest piyê xwe dikutin.

De te beg kuşt, min jî kur, bireve! Têllîyê digot.

Em revîn. Paşê bû hêwirza gund, qirçe- qirça gulla, em nedîtin, me xwe bin nawa aşa da veşart. Paşê me berê xwe da çîya, banîya seva welatekî dine.

Rêwîtiya Min

Ezê seva şuxulê mekteba biçûma nehya Şerûrê gundê Şawlîka şuxulê minî bi serkarê mektebê û bi sedrê şêwra gund bû. Sivê siheta 5- a rabûm, min karê xwe kir, wekî bi maşîna nîvro rêkevim, ber bi Şerûrê herim. Karê minî kirîbû, tenê min wextê maşînê raçev dikir. Piştî raçevkirina çend siheta, nîvro bû, ez birêketim berbi stansîyê çûm. Bi tiramvayê çûm gihîştîme stansîyê, li stansîyê gelek merî sekinîbûn, yê

ku bilêt distandin, seva cîya da biçûna. Nav qelebalixa wanda meriva dengê hev nedibhîst, min jî nobet pirsî û li ber dora xwe sekinîm, lê min zanibû, ku bilêt

naghêje min, lema jî ji wira derketim berbi nobeta komandîrovka çûm, û li rêza wan sekinîm. Kassa vebûbû, bere- bere bilêt didan. Ez jî nêzîk, pere hazir destê min da sekinîbûm.

Lê çevê minî li mîlîtsa bû " çika kingê bên, min ji vir derxin" difikirîm. Çimku kaqizê minî şandinê, min bîr kiribû, malda hiştibû. Min gelekî dora xwe dinihêrî, wekî merivekî nas bibînim. Ezî wê fikrêda nişkêva du merivê nas ber çevê min ketin. Ew jî seva standina bilêta vî- alî- wî alî diçûn- dihatin. Min ewana pak naskirin, û gazî kirê, yek Ezîzê Şemo, yê dine Teyfûrê Elî bû diha kuttabûna bilêta û hatina maşînê nêzîk dibû. Însan ser hevra diçûn- dihatin, em jî bê bilêt mabûn, rastî Tefûr dixwest hinekî nehestî bikira seva standina bilêta, lê milîtsa ew jî derxist û em mane bê bilêt.

Ez hinekî rûniştim û fikirîm, paşê min namek nivîsî, da Ezîz şand mal, seva anîna kaqizê minî lazim, Ezîz çû.

Ez û Teyfûr em derketibûne devra, seva hatina Ezîz me dinihêrî, gelek komke(tiramvay) dihatin diçûn, lê Ezîz têda nînbû.

Komkekê ji kaqiz, şikil û perçê reng- rengî neqîşandî ji dûrva xuya kir, ussa zû dihat merîya tirê difire, hat gihîşte stansiyê û nerm sekinî.

Gelle merivê bi kincê hevirmişê xase xemilandî jê peya bûn, lê Ezîz berî hemûya hat gihîşte me. Dest avîte cêva xwe, kaqiz derxist, da min.

Ez dîsa çûm, li cîyê xweyî berê sekinîm. Mexlûqetê wê derê geleka gazî min dikirin. Digotin hanî van pera, mera jî bilêta bistîn. Lê ji wan jî jinekê gelekî lavayî dikir, û pere raberî min dikir. Min îna nedikir, wekî ji yekê zêde bide. Lema jî min perê wê negirt. Min bilêt stand, pey min jî merivê wê derê gişka yeko- yeko standin, nişkêva bû ringe- ring, li zengil dan. Tenê lezketina min bi min ma.

Merivê wê derê, yê ku piştî hildan, yê ku bê piştî zû- zû diçûne ber maşînê diçûn, em jî çûn. her derîyara meriv bernedidan, tenê derîkîra ber didan, ew jî zef sixletî bû, derketina merivê bi piştî çetinbû.

Kandoxtira bêraqkê keske dest da ber derîya sekinî bûn, nedihîştin meriv têketina vagona merî sekinîbûn: gelek ber derê vagona seva hilkişyanê sekinîbûn, hineka jî millê xwe millê hevra kiribûn digerîyan û nerme nerme xeber didan.

Li wê derê jî hebûn gellek qîz, bûkê delal wekî bi kil çevêd xwe neqîşandibûn. Hatibûne wê derê seva rêkirina nasê xwe. Stansîye şên bû, merya tirê her alîyava li defê dixin, xelqî ussa xemilandî û bi kêf bûn. Ez jî ber dêrî sekinîbûm, min û hevaleyê bi hevra xeber dida, derheqa berê û niha, çewaku berê wextê padişê ew stansîya mîna cîkî xirave bû, lê niha çîqa xweş û bedew çêkirîye, me digot û em şadibûn.

Nişkêva derî vebûn, cimaet hikişîya kete vagona, em jî ketine yekê û têda rûniştin. Nav maşînêda qelebalix seva cîyê rûniştinê destpê dibû, hineka hinek radikirin, hinek jî seva rûniştinê vîalî- wîalî digeryan. paşê kandoktor hatin, pêda- pêda merî dane cîkirinê û rûniştandinê. Vagona ku ezî têda bûm, merîyê wê hela tamam rûneniştibûn, nişkêva zengil lê xistin, maşînê kire qûrîn û bi rêket, çû.

Ew maşîne berbi Culfê diçû, min xwe dabû ber pencerê û li best- beyara temaşe dikir: erdê gewr dikir, kulîyê berfê gire- gir dibarîyan, li rasta qozê pempûyê berevkirî nav berfê da nolî darê sincê gewr û boz dikirin, avê çema cemidî bûn, êdî deng jê nedihat, nedikirin xuşe- xuş. Gundîya li çolê kême- kême xûya dikir, îdî qîz û bûkê kolxozvan, tekmaile nav pempûyada çenek nedikirin li seyrangê nedigerîyan, dîsa ber hev nedidan, laqirdî nedikirin.

Tenê şivan- gavan bûn, wekî pez û dewar bere rasta dabûn, li ber agira rûniştibûn, nan dixarin, lê kifşî hebû, wekî ew şivan û gavanê kurmanc bûn, çimku kulavê

wane şivantîyê dirûyî, serkulke pêva, şûna şiva çêkirî, şiv û berşivkê wane –têda, kulav kiribûne alde li ber rûniştibûn. Weke kîlomêtrekê ji wan wêda jî desteke dine hev civya bûn, distiran, kilam digotin, carna jî destê hev digirtin. Qeydê koçerî û xelef " dilîstin devê yekîda jî tulumê xûya dikir, kivş bû, wekî wî li tulumê dixist, zefe eşq bûn.

Maşîne zûzû diçû, gele cî piş xweva dihîşt, gelek cîya jî disekinî, av hildida (stansîya) xelq peya dibû, hineke teze dîsa sîyar dibûn. Carekê jî maşîne li stansîya Qemerlîyê sekinî, Ezîz û Teyfûr berbi malê xwe çûn, ez jî li stansîyê digerîyam. Nişkêva merivekî bi dengê nenas selam da min.

Ez vegeryame alîyê silavdayî û min kêfê wî pirs kir. Ew dostê bavê minî berê Norêns bû, bi min şa bû, millê min girt û ez berbi mala xwe birim.

Ne carekê, ne ducara hema ussa li ser hev pirsava bavê min dikir û pêra jî heyfa xwe dianî. Maşîne çû wê şevê ez li mala wî mam. Mala wî li stansîya Qemerlîyê otaxeke wî ya xemilandî û kur, qîzeke wî hebûn. Kur 13 salî bû, lê qîze 8 salî bû, bavê min, time derheq wîda gilî dikir, digot, tu û ew tev diçûne ber berxa, hûn hevalê heve şirîn bûn. Lê bîra min nedihat. Êvarê wexta ku em rûniştibûn, ewî gilîyê kuştina bavê xwe û êtîm mayîna xwe ji destê taşnaka dikir, pêra jî axîn dikişand, digot, - wexta ku mala me û we ji hev qetîyan, mala we ber bi welatê romê revî, lê em mane li vêderê, bû daşnakî, bavê min ew zor û zulma wane ku dianîne serê gundîyê kesîb, qebûl nedikir, loma jî xeniqandin. Pey xeniqandina bavê min , em êtîm man, me gelek belengazî jî dît. 1920 salê ku dîwana şêwrê hat, ez hildame êtîmxanê û dame xwendinê , şukur naka min xwendin hildaye, firqevan û agranomê vê nehîyê me, bera xweş be dîwana şêwrê û firqa kommunistî got, xeberdana xwe kutakir.

Sivetirê ez anîme ber maşînê û berbi meskenê min verêkirim. Pencere maşînêra gelek gund, avayê teze çêkirî xweya dikirin. Lê avayîkî zef bedew rind li stansîya Araratê çêkirîbûn, li wêderê ronkaya êlêktrîkê jî hebû.

Ji wêra digotin, - Zavoda "semstroê" ew zavod zef lixaşa min dihat, wekî digotin, - vê zavodê da kilsê dişewitînin, bi wê xanmanê rind çêdikin. Maşîn wêderê sekinîbû, min û palekî zavodê xeberdida, ewî digot, - vî gundî Develîyêda zavodeke dine jî heye ew jî ya şerabê ye.

Li wî gundî gelek baqê tirîya, sêva hurmîya, zerdela, - qeysîya û yê mayîn hebûn, kivş bû, wekî wê nehyê da gerekê zavoda şerabê ese hebûya, û ya konsêrvayê jî lazim bû. Çimku meriv li dora xwe dinihêrî, qe îna nedikir ku êmîşê wêderê kutabe. Xeberdana wî hevalî pale û mêzekirina baq- baxata zef li min xweş dihat, nişkêva zengil lêxistin, min îzna xwe ji wî xwest, revîm, ancax gihîştîme maşînê û çûm.

Rêva hema ussa em ji baq- baxat û gundêd teze derbaz dibûn me dihiştin û em diçûn. Maşîn çiqasî nêzîkî stansîya Arazdayanê dibû, hêdî – hêdî niqil sist dikirin, sekinî, ez peya bûm.

Gundê kurmanca xûya dikirin, lodê mezin, xanîyê bilind kifş dibûn, kulekara, bixêrîyara dû derdiket, kifşî hebû, wekî tendûr û kuçik dadabûn. Kavirr bere ser gihê dabûn, gîhayê pezê êvarê dadanîn. Ez lap çûme nav gund, xanîyê wî gundî, yê kevn li ser edetê lapî berê dîwar bi tûrêd qêmûşe çêkirî, di wan xanîyada merî û heywan ser hevda dijîn, çend cîyê jî xanî kivş nedibûn, lê dû ji erdê hildikşîya, dengê meriva têda dihat. Ser xanîya qûje- qûja dîkê esir bûn. Dihate zanbûnê, wekî ew gundê zûdane, çimku ser xanîya gîha şînbûbû, kevirê merzela erdêda çûbûn, pûrt dabûn, nolî merivê kose rû xurî, geleka jî dîwarêd wan hilşîyabûn, hemîn ku kelefê xirabe jî kêm nînbûn. Kî ji mala derdiket çevêd xwe ji hêsira temîz dikir,

nolî "merivê dê mirî" ew ji dû bû. Hineka ser tendûra kinc şuştibûn, hêdî- hêdî ser tulumê şorê radixistin, bona zahabûnê. Kincê gelekî teze û perçê pak bûn, kifşî hebû, wekî perçe gelekî tînine wî gundî, hebûna wana pak û berekêva dîwanê guharîya jîyîna wane emrê teze jî fikir, dixast wana ji jîyana kevn derxe, qaydê jîyîna teze, kultûra teze nav wanda jî cî bike.

Ez mal, bi mal derbaz dibûm, berbi îdara şêwra gund diçûm, rêda kome zaro dihatin, çeltikê wana stûyada, hinek jî kitêb girtibûne destê xwe him dixwandin, him jî dihatin. Min dibihîst , wekî miqala "Memê û Eysê" dixûnin û rewa dikin, ji wana kurekî bedewî jîr, him dixwend him jî komekî dida hevala. Wexta piştî dîtina derbazkirina gunda wî halî ku ez çev wan ketim, dilê min jî eşqa tijî bû, ez sekinîm, min selam da wan. Hemûya bi hevra selama min vegirtin û ji komê yek nêzîkî min bû.

Min ji şabûna berê navê wî, kîjan komêda xwendina wî pirs kir. Ewî bi devekî ken cava min da û got- ez koma sisya da dixwûnim. Paşê min pirs kir: - navê te çî ye? – navê min Mehmed, navê bavê min Êso. Wekî herim, ezê bikaribim dersdarê we mektebêda bibînim ? – Belê got û çû. Pêş gund cîkî rast gelek xan- manê teze bi cêrge çêkiribûn, ji wan otaxa, ji yekê dûya soba derdiket, kome mêr pêş otaxê sekinî, ser berfa teze ketî laqirdî dikirin, berf hev werdikirin û bere hev didan. Hundur da jî kome merî rûniştibûn, ji wan wêda jî komeke jina bû, wekî kursêda dixandin.

Kursê êvarê 3 hev bûn, wekî kursêda xwendin û nivîsara rast, ya duda derheqa şêwrbûna Azarbaycanê, lê ya sisya derheqa her şeş şertê heval Stalîn derbaz dibûn.

Piştî kutabûna dersa, dersdar heval... Îsmayîl hat, me selam da hev û paşê ewî destpêkir got, - heta sala 1930 – vî gundîda merivê xwendî nedibûn, sala 1930 bi

saya dîwana şêwrê mekteb hate vekirinê, niha berkêva tê hilanînê nexwendîtî pîlanê xwendina borclî têne qedandinê. Vê gavê 200 kur- 180 qîz- 180 mêt- 180 jin bi zimanê kurmancî dixûnin û hînê hemû gilê- gotina divin, berekêva miqabilî jîyîna kevn disekinin. Wê şevê ez li mala wî mam.

Dersdar şiro dikir

Sala 1930 bû, ez bi malêva dimame li nehya şerûrê gundê Şawilîka. Wî gundîda gelek malê kurmanc wetenî bûbûn : lê hela gund da mekteb tune bû wan rojêd paşîn beş hebû, wekî mektebê vekin. Rojêke paîzê sar, berî nîvro maşîne ji Nexcîwanê hat, çû li stansîya Arazdayanê sekinî..

Ji maşînê merivekî bi kincêd xas peyabû, destekîda çemedanek berdestê dinê kitêb, devter girtibûn, rastî kê dihat, navê sedrê gund, cîyê îdara dipirsî. Hat kete îdara şêwra gund.

Êpêce wext derbaz bû, uzvê şêwra gund elametî dan, wekî siheta hevta civat- heye, gelekê gundî tamam îdara şêwra gundda hazir bin. Siheta 7 a bû, gundî bere bere diçûne civatê, ez jî çûm, nav cimaetêda rûniştim. Sedrê şêwrê û katibê uzeka komsomola xelq cî dikirin û didane rûniştandinê.

Sedir civat vekir, got :

-mizgîna min ji we gundîyê kesîb û nîvçera ! dîwana şêwrê îro ji bona we dersdar şandîye, mektebê vedike. Wexta gundîyê kesîb- nîvçe ev xeber bihîstin, ji eşqa-şabûna nizanbûn çî bikirana, ji dest li hev xistinê dengê meriva nedihate bihîstinê, ancax min dibihîst, wekî digotin- emir bike dîwana şêwrê firqa kommûnîsta !

Wê me jî bide xwendinê.

Alîkîda jî, dengê axe- ax, ofe- ofê ber guhê min diket, digotin- dewrana me çû, dewrana wan hat. Min ew deng lap pak seh fikir, lê min nizanbû ji kêderê tê, lema jî digeryam ku wan bibînim, kanê ew kîne ?

Çima ussa dikin ? min jî tirê brîndar hene, yan jî nexweş. Ew dengê wane tê.

Nişkêva meriv ber çevê min ket, li ber dîwarê rûnişt, piste- pista wane li civatê pirçûye xwe kiribûn "nolê merivê ewled mirî, sekinîbûn. Min lê nihêrî, ew kûlakêd gund Hesoyê Kelo, Keleşê Fero û mellê gund Misto ye, li hev civyane halê xweda dibêjin : raste heta niha gund da xebatçî hebûn, lê ji wana gelek xwendî û nîv xwendî bûn, dersdar jî hat, ew him bi xwey xwendî, him jî wê zara û mezina bide xwendinê û yê nexwendî jî bi her gilî- gotina bide serwext kirinê. Îdî kes gura me nake, ewê hemû sirrê me bide eyan kirinê, me ji dunyayê bide qetandinê.

Wexta ku sedr got, - ji bona mektebê otax dest xistin lazime, çika bêjin, ya kê layîqe ? em dikarin bi wedetî bikin mekteb ? katibê uzeka komsomola Hesenê Hancî rabû, got, - hevalno ! qanûn rê nade ku em gundîyê kesîb û nîvçe ji xan manê wan derxin, lê wext jî pêra gihîştîye, êdî em nikarin teze ji bona mektebê xan- mana avakin, lazime wekî em otaxa kulakê gund Hesoyê Kelo jê bistînin.

Ewê yekê lap agir bere dilê "koma bi şîn" da civatê qirar da, wekî wê otaxê ji wî bistînin û çiqas zarê emrê xwendinê hene, bişînin xwendinê. Civat bi dest, li hev xistineke giran kutabû.

Sivetirê dersdarî li hîvya şagirta bû, ku zarê bèn. Zaru zef kê m hatibûn. Tu nevê wê şevê kulak, şêx, mellê gund şev heta sivê ketine nav gund pravaktsîya belakirine, loma zaru nayên.

Sedrê gund û dersdar, carke din ketin nav gund û navnîşa zarê emrê mektebê girtin, û dîsa dê bavê wan derheqa xwendinêda dane serwextkirinê. Heso jî hela otax bi pakî vala nekiribû, digot, kengê zaru hatin, ezê paşê valakim. Hemîn ku kulak û

dîndarê gund seva stendina otaxa wî razî nînbûn. Sedir bi qelebalixeke giran ew jî vala kir.

Şagirt dihatin, 70 kur, 53 qîza dixwend, gundî deste – deste dihatin temaşa xwendina wan dikirin, wan roja çevê minî li Heso bû, ewî şer dixast, dixast wekî yek derheq nepakîya xwendinêda tiştêkî bêje, yan jî gilîkî ji nepakîya dîwanê xeberde, seva ew jî derê gilîya veke, derd û kulê xwe bêje, loma banzdida ber devê her kesî û gilî jê dipirsîn.

Rokê jî ez seva standina perçe û şekir ber koopêratîvê sekinîbûm. Perçe û şekirîbol bû, kê çiqas dixast, distand, lê perê min malda mabûn, ez hîvîya ji mal anîna pera mabûm, Heso zanibû, wekî pere bi minra tunenin, hinekî dora min çû- hat, got, kerem ke mal. Ez neçûm, paşê got, - dibe tu seva pera sekinî ? were pere çiqas lazimin, bidim.

Min qestbende got, lê paşê ezê ji ku bînim, bidme te ? tenê tu eva otaxê komekê bide, bera otaxê ji destê min neçe, pere xweşhelalî te bin. Min dixast wekî nêta dilê wî zanibim, min ew jî pak eyan kir, û paşê guh nedayê û çûm.

Sive bû uzeka komsomola Hesenê Hacî derî kuta û paşê hate hundur, mîna merivekî dev bi ken got, berî selamê mizgîna min : êdî gundî hêsabûn, pêşîra me ji kulak û dîndara xilas bû, gund steqirîye, zaru bi 100% hatine mektebê.

-çibû ? min pirs kir.

-kulak û dîndar girtin, malê wan nihêrîn, mala Heso da 3 tiving qirmek jî girtin, ez şa bûm, min mizgîna wî kitêbeke," xu xu hînbûna xwendina kurmancî"dayê pey girtina wanra êdî zaru ji mektebê nediman, şuxulê xwendinê ro- bi ro pêşda çû. Min hêca fem kir, wekî şuxul paşda dixist.

"Berê kurê Koso, paşê Zekî"

Seydo kurê Ahmedê Kose ye, Ahmed emrê xwe payê pir xulamtî û berdestê axa, bega û dewletîya derbaz kirîye.

Nav salêda her axakî wî, çend nave cure- cure danîbûne ser, lê navê wî lapê paşîn danîbûn "Koso" , niha jî gundî dîsa gelek cara, Ahmed bi wî navî nav dikin û gazî dikinê, tenê ew van salê paşîn bû, wekî dibêjin Ahmed.

Raste her kê niha bi navê Ahmed nav dikin, lê dîsa carna heta navê wê berê "Koso" hilnedin, gele merî nasakin. Koso niha kolxozêda serekê birîgada me ye ew bi dilcan dixebite, hebûna kolxozê zêde dike. Heta roja îro, ew çend cara derbdar hatîye kivşkirin, çend cara ji nehya me, alîyê kolxozvanada wekîl bijartine, şandine Moskovayê hemcivata kolxozvana. Gerekê bêjim, wekî her şuxulekî ku Koso kolxozêda dike, ew ji bona kolxozvana dibe nûbar, cerbandin. Lema jî, ew neku tenê kolxoza meda, nav hemû kolxozvanê nehyêda, ji kolxozvanê êgin, zane û heskirî tê hesavkirinê. Koso bi wê xebata xweyî rind, bi wî aqilê xweyî ceribandî, îja niha bi navê Zekî(zên) tê nav kirin.

Zekî merivekî xwendinhize, ewî gundda, kursa êvarêda koma pêncê kuta kirîye , êvar- êvar gelek kitêb û birûşûrê derheqa malhebûna gundîya da dixûne. Ewî çend sal berê kurê xwe jî ussa dişande mekteba gund û paşê jî şand palfakê (fakultêta pala).

Niha Seyad vê biharê teze ji palfakê hatîye gundê Axûrê. Seyadî bi xwendin û hazirya xweva gelekî pêşdaye, lema jî ew şandine ser xebata sedirtîya kolxoza wî gundî.

Gundê ku Seyad têda dixebite, gelek baxê tiriya, sêva, hurmêya , şevtela, gûza û yê mayîn hene. Li wêderê, wexta ku sive ron dibe, ro teze tîrêjê xwe notla têlê zirîcê davêje her alîya, ji dest belgê dara nayê dîtin. Bihara, wêderê dengê çivîk, reşêla, pepûka, û leglega dinê şên dike. Avê kaniya sipî mîna şîr cewkê ziravda, nav gîha û kulîlkê reng- rengîda dikişin, diçine ser- zevî û bistanê kolxoza wan. Gilîyê rast, ez ji hewa wêderê zef hiz dikim, li wêderê medê min vedibe, erdê wêderê jî zef li min xweş tê. Ewana wextê bihara bin baxa, ber kanîyê rûnişteka datînin, gelek cara hema civatê xwe jî li wê derê dikin.

Civata ku têda Seyad qebûlî nav firqê kirin, ew jî dîsa li wê derê, bin wan baxa da bû. Derbazbûna Seyadê nav firqê, wa bû:

Gelek merîya erze dabûn, wekî bikevin nav firqê, ji wana gelek jî keç û jin bûn, lê Seyad erza xwe berî hemûya dabû.

Piştî vebûna civatê û qedandina çend meselê din, berî hemûya erza Seyad danîne civatê, xwendin. Paşê gilî dane Seyad, wekî serhatîya xwe bi çend gilîya da nas kirin, ji wana yek jî xebera "berê kurê Koso , paşê Zekî" bû.

Paşê gelek pirsê mayên danê, wexta pirsê raste geleka pirs didan, lê ji hemûya zeftir Têlî bû, wekî qe mecal nedida tu kesî. Çimku Têlî bi xwe firqevana orta kuta kirîye bû û eva sale jî xebata firqêda dixebite, lema jî zef û pirsêd kûrdidane Seyad. Piştî gelek pirsêd din, Têlîyê got: heval Seyad, nîşana dîwana me çewane? Seyad qe nefikirî got, her dîwanekê angora xwe, nîşaneke wê heye. Lê nîşana dîwana me jî, ji das, çakûç û stêrka pênc goşe ye.

-Das û çakûçê çi nîşan didin? Têlîyê pirs kir.

-Ew das û çakûçê li nîşanê, mehkemîya tifaxa xebatkara û gundîyê emekdar nîşan didin.

-li ser nîşanê diha çi heye?

-Herfêd :T. S. S. C. hatine nivîsarê.

-Ew herf çi nîşan didin? Herke zanî yeko- yeko şiroveke.

-Ew herfana yanî, tifaxa sosyalîstîya şêwra cimhûrîyeta, nîşan didin.

Xebera tifaqê, çêkirina qeweteke bona welatê şêwrêya başqe- başqe, li cîkî berevbûna wanra tê gotinê.

Xebera sosyalîstîyê, li welatê tevî vê tifaqê çêkirina hîmê sosyalîzmê, nîşan dide. Yanî li wan welata, erd û fabrîk ji destê kapîtalîst û milkedara hatine standinê, ketine ixtîyara (destê) xebatkar û gundîyê emekder.

Xebera şêwrê, li wî welatî organa lape mezin, şêwra wekîlêd emekdarabûnê, nîşan dide. Xebera cumhûrîyetê, dîwan di destê wekîladabûnê, nîşan dide.

-Seyad bi wê xebera xwe paşîn kuta kir.

Paşê Têllîyê çend pirsê dine derheqa malhebûnê danê, Seyad caba wanjî yeko-yeko da, hemîn ku hevalê mayin jî, wextê pirs dayînê, caba xwe tamamî distandin.

Paşê derheq pakî- nepakîya Seyad pirs dan, wekî xeberdana kê heye, bera rabe, xeberde lê ji rabûya, her dixastin xebatvantîya Seyad bêjin û heyfîya wî eyankin. Hemîn ku tercuma halê wî jî eyanbû, wekî bavê wî, "berê Koso, paşê bû Zekî".

Bi eşqeke nedîtî û dest li hev xistineke bi deng, Seyad hildane nav cêrga firqevana. Seyad jî soz da, wekî xebata xwe û hazirya xwe diha zêdeke, diha gelekî xebatê, pêşda bide û hazirya xwe jî zêdeke.

Elî û Dîlber

Dora gundê Quldûzê bi çemêd zirav, avêd zelal helqe kirîye. Raste pêş gund nola avê behra rast, tîrêja royê ku dide ser ava, ew rast ji her alîyava dibirqe. Li ber devê ava, pêş mala darê teze, baxçê cûçik hatine çikandinê. Wexta biharê gund ji belgêd dara, kulîlkêd gîha reng- rengî û ji teyrêd cure- cure tê xemilandinê.

Ew gund bi qaydê teze bi destê dîwana şêwrê xanmanê wî cêrga bi pîlan hatine danînê. Çaxê ku tava sivê dîzerqîne, ro mîna sinîka zêrîn derdikeve, tîrêjê xwe mîna têtê zêrîn dadihêle erdê, merî teze ji nav cîya radibin, ji sewta bilbil û çivîkêd reng- rengî, kalînya mî û berxa nizane kîjan alî binhêre. Kelefê gundê berê gelek hatine xiravkirinê, şûna wan bax û bostan şîn bûne, malê kevirî jî, kevirê wan xirav kirine, pê kevirê wan mekteba gund teze danîne.

Di wî gundîda, xên ji 145 malê kurmanc gelek jî ecem û file hene di gundda kolxozeke ji sê mileta "Întêrnatsîyonalî" teşkîl bûye. Kolxozvan hero wextêda diçine ser xebatê, bêsebeb qe yek ji xebatê namîne.

Bona kifşkirina wextê kolxoznîka wextêda berevbûna wane ser xebatê, orta gund, dara reşe mezinda zengulekî mezin hatîye dardakirinê. Wexta zengul deng dida, meriv dive eynî gazî dike dibêje, - "rabin! Rabin, rabin" wexta xebatêye.

Ussa dilê meriv berbi xebatê dikelîne. Kolxozvanê gund, jin- mêr hemû li ser hev dilşewitî ji hev hizdikin. Niha hersê millet ji payê pir zimanê hev dizanin, xeberridin, nav gundda, mektebêda bi xeberdanê meriv nikare miletekî ji yê din bibijêre ussa jî bi nêt û fikrê.

Lê çî hatîye ezê bêjim, wextê teşkîlbûna kolxozê şêx, mele, keşîş û merivê li ser rîya wan çûyî jî kê mînbûn. Raste çiqas ewna hebûn, diha ji wan zeftir, komûnîst,

komsomol û merivê bi qelbê temiz û baş jî hebûn. Kolxozêda xortekî komsomol navê wî Elî û qîzeke bedew navê wê Dîlber hebûn. Elî û Dîlber zef ji hev hiz dikirin, huba wan avîtibû ser hev, herda ussa hev hebandibûn ku rokê hev nedîtana, wê rojê nolî merivê sevdaserî nan av nedixarin, wê bigerîyana wekî hev bibînin. Keçik file, lê lawik kurmanc bû. Kulak û dîndarêd gund nedixastin kolxoz, pêşda here, malhebûna wê zêdebe, biratîya întêrnatsîyonalîsê mehkembe. Lema jî wana herdem provakatsîya û gilîyê milletîyê davîtine nav gundîya, wekî her dîndarekî nav milletê wanda hurmeta wî nekeve. Rojekê jî dîsa mala şêx Keleş da hemû dîndarê(şêx, mele, seyid) gund civyabûn, gazî çend rûspîya jî kiribûn, wî çaxî uzvê kolxozê Hotoyê Hesen jî çûbû.

Berî hemûya şêx Keleş gotibû –" gelî: rûspî û dîndarêd gund, hela cahilê we cahilin, femnakin, lê hûn çima wana serwext nakin, çewa kurmanc bi mêrê ermenîyara biratîyê dayne, xarina wan, rabûn, rûniştandina wan yek û li erdekî be, gerekê niha nanê hev nexarana, pakî hevra xeber nedana, neku axirîyê Eloyê komsomol keçika ermenî bistîne, bibe zavê wan û şêx mela ber tişteki nehesibîne, îja çi hurmet, çi sîyanet û xêr bereket li ku ma?

Wexta şêx xeberdida û bi gilî- gotinêd xwe yekê ya din hevnegirtî, dixast nav gundda dijminayê pêşda bîne, Hoto hema wî çaxî mîna merivekî vecinîqê, nişkava rabû ser pîya, tilîya xwe ser şêx Keleş da hejand û got:

Bes! Avzazîya bikin, seva hurmeta, dijminayê bikine nav gund û xûna xebatkara bi wan bidine xarinê. Kengê hevra bi dijmin bin, wî çaxî xêr- bereket wê zefbe, erê? Lê kolxozê ev mî, niîn û baxat ji ku anîne. Ew xan- manê çîlê qerqaş, zevî û ga, çêlek yê kêne? Heta biratîya me bi hevra tunebû, em nêzda dimirin, we jî kêf dikir: çîqa erdê rind, cîyê rind dest weda bû, seva wê ye, erê? Lê Elî Dîlbera bejinzirav nestîne? Çima ku file ye, qîza te, Eyşika dîn bistîne? Çima, seva çi? Heta kengê hûnê bixazin ku koka me bi destê me bidin birînê, êdî bese!

Em bi vir- derewê we hesyane, em hemû jî merîne, yekin, kî bi aqilî merîfete, zane ye, ewî pake, kî nola we avzaze, vireke ewî nepake. Wexta Hoto xeberdida meriv digot, wexta darekî bigre destê xwe, lêxe serê şêx bişkêne, şêx jî destda xwe cincilandibû ser hev,, îja Hoto bi milê şêx digirt, radikire ser pîya, hebûna kolxozê pê tilîyê xwe dijmirî. Şêx nizanibû ku çewa xwe ji destê wî xilaske. Piştî pêhesandina nêt meremê kulak û dîndarêd gund ew ji gund hatine qewirandinê girtinê. Çîqa (çûbû) diçû, robiro huba Elî û Dîlberê zêde dibûn.

Rokê Elî hatibû xebata çolê, nav baxa, lê wê rojê serê Dîlberê diêşya, nehatibû.
Berî êvarê wexta kolxozvan ji xevatê vegeşyan, Elî dest xwera xwe gîhande
Dîlberê. Divê ku ez dibêjim Dîlber, hinek bêjin, - ne navê filane. Lê wî gundîda file
navê kurmanca, kurmanc navê fila û yê ecema li zarê xwe dikin, qîz xortê
tezegihîştî gişk bi forma teze li xwe dikin. Hela bîra minda ye wekî Elî û Dîlberê bi
deng hevra xeberdidan.

Elî digot: lê lê Dîlber, tu ji ku têy?

Ji xebata kolxozê şûnda mayî

Tu nehatibûyî ez dîn dibûm,

Ji eşqa sewdaserê dibûm

Dîlberê digot : - lolo Elî, xema neke

Eşqa dinêra ez ya te me,

Tu xema neke ji xemê dilara

Bimrim ji erdêra, bimînim ji te ra

-lê lê Dîlber tu min dixapînî

Bawer nakim, tu min bistînî

Eman- eman keçikê qurba

Ez dişewitim halê xweda

Xweşe- xweşa avê çema, kanya

Gure- gura ewr û ezmana

Lawik qurbana xema neke.

Qîrar- qesem ez ya te me

-agirê dilê minî gurre,

Mîna agirê karpîtî fûre- fûre,

Xem û xeyla min Dîlber tu yî.

Paşê Elî û Dîlber hev standin, niha bi dilekî eşq Dîlber û Elî nav kolxozêda bi hevalêd hizkirî va dixebitin.

Ber çetiniya huner

Dê û bavê min êdî emrê xwe bihoritibûn, herekê nêzîkî çil pêncî emir kiribûn, ewladê wan jî ez tenê bûm, şîrîniya ji mirina digotin, Ezîz.

Wan li ser desta û bi parîyê devê xwe, ez mezin kiribûm, gihandibûne 12 salîyê ku bi min hêsabûna.

Edî bişkûrîkî pak ji min derketibû, min li ber desta her tişt dikaribû rihet bikira. Berxvantî, golikvantî û hodaxtîya tirka jî bi min dibû.

Êvara wextê em li ber bixêrîya meye malê, yan jî ber tendûrê rûdiniştin, hinekî bîna bavê min dihate ber, ewî axînî dikişand û digot, Ezîzê min, lawo, tu rind mezin bûyî, minra gihîştî, bişkûrîkî pak jî ji te derketîye, min dikaribû tu bikirayî her tiştî û bi te hêsa bûma...lê çi feyde,...ji xelqêranî...dîsa gazî min dikir, dihate rûyê min û axînî kûr dikişand.

Her gava bavê min usa digot, rengê wî dixeydî dêya min jî mîna tişteki ber dilê wîda dihat, digot. Êh, çi ber xwe dikevî, bera kurê meyî saxbe ussa nebêje, Ezîzê berxwe keve. Carna jî ber xweda digot, - malê dinê milkê bavê kê ye, kurê te waye tera gihîşt, hûn salekê dest bidine- destê hev, eva wera min carna ji dêya xwe dipirsî, - daykê can, daykê ! çima hema ku êvar tê, bavê min hinekî bi min şadibe, paşê jî minra dibêje, tuyî ji xelqêranî ? divê ku we ez pêş deynava dabime hineka, yan jî hinekê min zorê bibin ?

Ewê bi xeberêd xwe şîrîn ez didame înakirinê, wekî tişê ussa tunne. Gilîyê rast bêjim, dêya min hela ji bavê min geletir ji min hiz dikir, wekî pir- hindik min pirçûyê xwe dikir, ewê lap xwe şaş dikir, nizanbû çi bikira, ussa diltenik bû. Lema jî dihate rûyê min digot, - dayka te qurbana teve Ezîzê minî delal, tiştê ussa tunne. Bavê te seva kesîbtîya me dibêje, wekî ji sivê heta êvarê ji xelqêra dixebite.

-daykê ! çima bavê min qe ji mera naxebite, îzna wî tune seva xwe bixebite ? min pirs kir.

-na, dê bi qurban, îzna wî heye, lê mîna tunebûnê ye, xelqêra dixebite, pir- hindik heq distîne, xebata me ji ku hatîye ?

Lê xebata kê ye ? ku bavê min sivê heta êvarê qe rûçikê malê, ussa bi dil- can dixebite, çima qe tişteki me tê tune ?

-wekî ussa jî nexebite, hew nadinê, wê derxin, lê wê me bi çi xweyîke ? qe zanî bavê te xulamê kê ye ? axê wî nehya Noreşînê destda diricife, ewî heta niha çend xulamê nolî bavê te bikutana qamçîya kuştîye.

Ez mîna merivekî teze jixewrabûyî, ser hişê xweda hatim, bi wan xeberê dênga xwe belengaz min lap aqil girt, ku ez sivê heta êvarê, tevî zarê gund hol dilîzim, lîstika kapada pişta destê min qelişî ne, guleşêda kinc jî li min nemane, lê bavê min sivê heta êvarê pişta wî ji kişandina sepetê gemara bin dewarê Qasimbegê rasteve nayê, hezar derd- kulê wan dikişîne seva kinckirin û xweyîkirina min. Lê min nizanbû çi bikira. Êvarekêda wextê bavê min ew xebera xwe herro wekiland hema wî çaxî dilê min xirab bû. Ez girîyam, min xwe avîte pêşa bavê xwe û lavayî kir, wekî seva min jî xebatekê bibîne, ez jî bixebitim. Hema wî çaxî dê û bavê min herda jî destê stûyê minra birin, ew jî ser minda girîyan, nolî maleke bişîn zûkîn kete nav me kulfetê malê, em ser hevda girîyan.

Dive ku naka hinek bêjin, çima çi qewimî bû, wekî gişk ser hevda rûniştibûn digirîyan. Lê girîyê meyî bicî bû, em sê kulfetê malê, dudu sivê heta êvarê dixebitîn, dîsa ebûra me nedibû : xarina me nanê sulufî, li xwe kirina me eva, nivînê me xesîl bûn, carna me ew jî nedidît.

Mirin jî ji wî halî me çêtir bû, ferezî êdî eme bê îlac û bê xweyî bûn, kesekî me tune bû. Piştî gelek îske- îsk û girî dê û bavê min êdî nedigirîyan lê ez aş nedibûm, min hela dixast bi girî dilê xwe hêsa bikim. Dêya mine belengaz û bavê min dihatin ber min rûdiniştin, çevê min ji hêsa temiz dikirin, û ber min digirîyan, wekî ber xwe nekevim, xebatê ji wana nexwezim. Min çiqasî pir got, wan ez zaro dihesibandim, hindik bihîstin, tu rêya xebatê pêşîya min nexistin.

Ji kela dil, wê şevê heta sivê xew nekete çevê min, min seva kesîbtîya me fikir dikir, yek jî seva sibê çika çi xebatê bikim difikirîm, lê min tu rê dernedixist, tenê her xebata bavê min bû, wekî pirhindik ezî pêyî beled bûm, min dizanibû. Gilî hatîye ezê bêjim carna, wekî min jî şuxulê nolanî şuxulê bavê xwe dikir, dêya min

dikenîya digot, - çi nolî bavê xwe natevitî. Bavê min jî pêra- pêra beşera wî xweş dibû, digot,

-"pêşê puder, milkî puser" xebera farisaye. Hemînkû gerekê " li mi here bînê wê wê jî bike loma jî dibêjim, pêşê bava, milkê zarane".

Dêya min jî digot, - weylê rojreşî, kurmancî pak nizane, bi farisî xeber dide, em hinekî şa dibûn, lê hemîn ku bextê meyî bi me ra bû.

Ez difikirîm seva xebata sivê.

Sivê mîtna hindik mabû, ez rabûm min eba xwe stûyê xweda danî, bendê xwe da piştê xwe, berbi tewla mala Kazim begê çûm. Hela tarî bû, gundî gişke razayî bûn, pîskê baranê gire- gir dibarîn, ji kerîyê pêz dengê mîyê tezezayî dikirne kale- kal, carna jî dengê ewtîna seyê şivanî û şeçe- şeqa leg- lega serê darê bû.

Gundî steqirî bû, kê dizanbû, wekî Ezîz vê şevê rabûye diçe ser xebatê.

Min ji tirsê seyê şivanî newêrbû eşkela merd- merdane biçûma, tele- tel ber dîwara çûm gihîştme ber derê tewlê.

Çaxê min derê tewlê vekir, çevê dewêr dibiriqîn, orînîya çêleka bû, fişînya gamêşa, repe- repa lingê hespa bû.

Qudûmê min şikest, min fikir dikir. Carna min dil- cegerê xwe tev dianî, derî vedikir, taqet nedikir, dîsa rep, digirt. Carna jî min derê tewlê vedikir lap dida ser piştê, nişkêva dîsa qeretû dihatine ber çevê min, pêra- pêra min derî davît û hinekî jê dûr diketim. Hesp, gamêş, dewar hemû rabûbûn ser pêya, wana jî tirê ezê binê wan temiz kim, tîmar kim, dewêr dikire orîn, hespa dikire fire- fir, erd pêkol dikirin, min jî tirê ez li ber dêrî sekinîbûm, hinekî hema ji tewlê derên, bi qirika min bigirin, porê serê min bijûn- bijûnî bûbû, xuydanê ser minra avîtibû, sekinîbûm û difikirîm herim, yanê na ? ew xebera ku digotin "şevê elk li hespa sîyar dibe, "nişkêva kete bîra min. vê carê qudûmê min lap şikest, çokê min sistbûn, dilê min dikire terpe- terp. Min dengê terpînya dilê xwe dibihîst, êdî paşda vegerandin jî bi min nedibû. Min çi qasî dixast bikime qûrîn, lê deng jî, ji min dervediket.

Ez ussa difikirîm, alîkî jî çevê mine li esmana bûn, min digot, gelo, kingê siveyê ron be, ez ji vê belayê xilas bim, lê sive jî tune bû.

Êpêce wext şûnda min nihêrî, ji esmana bere- bere stêrk kê m dibin, tenê stêrkê bi şefeq dimînin. Pêwr, Mêzîn jî çûne ava, stêrka Kawranqiranê jî lap bilind bû, hat welgerîya, çû ava, stêrka sivê avît, bilind bû, gewrayî kete alîyê rohilatê, esman sipî bûn, êdî bû segura sivê.

Êdî terpîniya dilê min tunebû, germaya min jî danî bû, min serê xwe nizm kir, ber qulika dêrîra li hundurê tewlê nihêrî. Nava tewlê jî bûbû ronayî meriva heywan ji hev nas dikir, zanibû kîjan deware, kîjan gamêşe, yanjî hespe. Êdî min zanibû ku, wextê hatina bavê min jî hindik maye, wê bê. Min bi dilekî tirs derî vekir, da ser piştê, hinekî hundurê tewlê nihêrî û paşê jî çûme hundur nav dêwêr geryam, bi zikê heywîn jî nihêrî, tişteke tune bû.

Paşê min bêr, çelqî û sepet anî, wekî binê heywîn vemalim min destpê kiribû bêr dikir, carna wekî gamêşa serê xwe ber bi min dianîn, dikirine fişîn min banzdida û direvîme cîkî din. Lê hemînkû min newêrbû piştê xwe alîyê hespada kira, min tirê, Elkê ji ser piştê hespa bi porê xweyî gijikva banzde ser min ". min tewle temiz kir, çû sepet anî, gemar hindik- hindik dikire sepetê û bi halekî çetin hildida xwe, dibir diavît. Axiryê min ew jî kutakir, hê teze ser afirê çêleka rûniştibûm, ku bîna xwe bistînim, nişkêva bavê min bi sepetêva kete hundur, çevê bi hêsir, ber xwedajî dikire : lawo, lawo , digirya. Ewî ez li ser êfir dîtîm ! sepet avît, hulmeyî min kir, ez kirime hemêza xwe û bi tirse- tirs ji min pirs kir : kê tu anî vira, ka rengê te ? pey bavê min dengê girî li min tesele bû, paşê dêya min bi porê xweyî şenekirîva kete hundur, ez dîtîm, hate bal min, ez ramûsam, û hinekî rûnişt, ew û bavê min dîsa girîyan, wan jî tirê, cina ez anîme, "yan jî dîn bûme. Paşê dêya min ez birme mal, bavê min jî li ser xebata xwe ma.

Rêva dêya min, zû- zû ji min dipirsî, kê tu biribûyî ? çûbûyî çî ?

Min çiqasî digot- seva xebatê çûme, îna nedikir, betanê çevê min weldigerand, lê dinihêrî. Carna jî digot- rengê te çima sipî bûye ?

Derheq tirsê xweda min tu tişt nedigot, lê çî tirs, hemînkû ziravê min qetîyabû".

Em çûne mal. Dêya min pêra- pêra cî danî ez kirime nav. Êvara, şev jî qerewiltî dikir, ranediza seva dîsa cin min nevin" hema ussa hişyarbû, carna jî li ser min dinivat(digerland) . Hela ew xebera dêya mine bîra minda ye, wekî digot : zulm welgere, kesîbtî jî serda, mêrî bin sepetada, min Ezîz jî derda, îro şûnda li min heram be ava van erdada.

Min çiqasî xebat kirî(temizkirina tewlê) digot, dîsa îna nedikir. Çend roja şûnda dît wekî tiştê ussa tune, ez sipartime bavê min, wekî sive- sive pêra herme tewlê, ez jî bavê xwera diçûm.

Bela kesîba ji ber piya radibe.

Derd- kula min ne besî min bû, wekî ez diçûme tewlê, kurê Qasim begêyî piçûk jî dihate wêderê, ez dibirim ser afirê golika qelêtek davîte stûyê min, gîha dikire ber min, bavê minra digot,- Qasik, Qasiko, hela binhêre, golikê min jî gîhê duxwe, û emrê ser min dikir, buxe! Buxwe.

Min jî bixasta- nexasta gerekê devê xwe bida ser gîhê û biçûya, herke min usa nekira, wê bigirîya, xanima mezinê bihata, carna jî, pê şiva lingê min dixist, digot- hiç- hiç mîrato çima ussa gîhê dirêjî.

Wextê bavê min gemara tewlê diavît, ewî jî sepetek bi min dida anînê, dikete hundur, bavê min ew sepet jî hildida pişta min û bidestekî jî alî min dikir, me ew dibir û dianî hundur. Halê me ew bû, heta ku firk kete pişta min, ji wêjî pişta min sist bû, pêlekê dîsa ketime nav cîya, êdî ji wê şûnda nediçûm, hevalêd min dihatin cem min, me malda kap dilîst, laqirdî dikir.

Carna ku me bi lîstikêd: pistûkê, mêşokê kap ji hev dibir , wekî dane nedida, eseyî nav meda dibû şer- dewe me li hev dixist û axiryê me berî zarêd şêxa dida.

Carekê jî êvarê ez, dêya min û bavê min me lingê xwe kiribûne tendûrê û xeberdida. Hema wî çaxî hate ser şerê meyî wê rojê, wekî ez wî şerîda çawa pak, qoçax xebitîbûm û çewa çûbûme tewlê, tirsîyabûm û naka jî tirsî kurê begî çûk sivê heta êvarê ji mal dernediketim. Bavê min Kenya, got: hişbin, ezê serhatîke nolanî serhatîya kurê xwe bêjim. Em steqrîn, ewî destpêkir:

Wextekê mêr jinek hebûne, navê mêr Şaptirîk, navê jinê Werdek bûye.

Şaptirîk jî nola te newêrek, lê ewî ji rûvîya newêr bûye. Ji tirsî rûvîya sibê heta êvarê ketîye tendûrê derî ser xweda dadaye.

Werdekê parîyê nanê dest xistî anîne, dayê, ewî jî tendûrêda xarîye.

Wekî derî hinekî vekirî mabûye, pêra- pêra kirîye qûrîn: dêrî bigrin! Rûvîyê bèn min buxun.

Bi şîreta Eloyê gavanî rûspî, carekê Werdek kada, bîşîya dipêje, hildide diçe ser kulekê, wan kada û bîşîya çend heba kulekêra davêje, nav malê çend heva jî ji sivderê heta derê malê direşîne çend heva jî tîne mal, pêşberî Şaptirîk rûdinê duxwe.

Ew çi bûn kulekêra diketin, te ew kada ji ku anîne? Şaptrîk dipirse.

-kada, bîşî dibarin, derva hatine çokê.

-çika hineka bide min jî, lê çima qe nayên bal min jî nakevin, mîrata, Şaptirk dixaze...

Kulê neketî, wane tijî ne, tu jî here, bîne, buxwe. Jinik divêje.

-Ne rûvîye min buxun.

-Rûvî tunenin, ezê li ber derê bisekinim, tu herre.

Şaptirîk ji tendûrê, derdikeve, tirse- tirs kadê nav malê berev dike, dixaze dîsa têkeve tendûrê, lê jinik nahêle, emr dike, wekî kadê sivderê û derê malê jî bîne. Çaxê ku Şaptirîk yê sivederê berev dike, lingê xu ji şêmîkê davêje der, Werdek pêra- para dêrî serda kilît dike... Şaptirîk hema li ber dêrî dike hewar :-

Eman, rûvîya ez xarim, dêrî veke...

Çiqasî dike- nake Werdek dêrî venake, axirê neçar dimîne û nolî merivekî canbêzar divêje : wekî venakî ? hine ar, hêkekê, hinek jî dêlbijîyê hespa bide min, ezê herim.

Werdek tiştê wî xastî qulika dêrîra didê, û ew diçe. Hinekî ji gund dût dikeve, rêva Dêwek rastî wî tê, dêw divêje : tu kî ?

Şaptirîk divêje :- ez palewan Şaptirîkim. Dêw divêje.- were em qeweta hev bicêrbînin.

Şaptirk divêje: were. Dêw divêje, - em çi bikin? Şaptirk divêje, - heryek ji me keviyekî bigre destê xwe û bi destekî hûrke bike ar bavêje.

Dêw pêra – pêra keviyekî ji erdê hildide, nav destê xweda hûr dike, dide ba.

Ew jî hêkê digre destê xwe û digivişe, hêk dişkê, êr jî quloz dike û divêje, xên ji hûr kirinê, min av jî ji kevir derxist.

Paşê dêw divêje, - were em binçengê xwe birûçkînin çika pirça binçenga kê dirêje. Şaptirk divêje, - birûçkîne!

Dêw dirûçkîne, dirêjaya pirça binçenga wî angora buhustekê, lê şaptirk dêlbijîya derdixe, wekî dirêjaya wan du buhustajî dirêjtire. Dêw ditirse, diricife, xwe şaş dike, û divêje:- em şeş birane, were tu jî bibe birayê meyî hevta, yê mezin jî tu.

Ew dêw sozê biratîyê didine hev û ber bi mala dêw diçin. Dêw pêşda diçe mal û birayêd xwe (xue) malra divêje: - min yek bi xwera anîye, çewaku birayê meyî mezin, nebe! Hûn kême zêde xeberdin, wê me hemûya bike, lepe herî li dîwêrxê."heta min kevir kire ar, ewî kire ar, û av jî jê derxist. Pirça binçengê wî ji ya min du buhusta jî dirêjtir bû.

Şaptirîk jî dive birayê dêwa. Dêw hero diçine nêçîrê, Şaptirîk malda dimîne. Hero dêw ava xwe meşka gada tînin, rojekê jî Şaptirîk ra divêjin

-Şaptirîk can! Îro em westîyane, ca banzde meşkê avê dake bîne.

Şaptirîk ancax valatî dikare hilde, hingilekî meşkê digre, erdêra kaşdike dibe ber kanîyê. Li wêderê meşkê pifdide, weke kulmek jî avê dike û hildide tê nêzîk, hindik dimîne bigîne dêwa, devê meşkê dide ser devê xwe bayê wê ber dide. Dêw dikine gazî:

-çima avê duxî, nayînî?

Şaptirîk divêje, - ez tîna biçîm.

Dêw dîsa ditirsin, xwe jê dikişînin. Rokê jî dêw divêjin: - şaptirk can! Ardû tune, îro jî tu here êrdû bîne,(darê şewatê) Şaptirîk radive çiq çirî- zincîr hebûne hildide diçe nava mêşe û dest pêdike, şirîta dora mêşe dive- tîne: ji dêwa yek divîne, li yê mayîn dike hewar. Dêw berev divin, tîne cem Şaptirîk, - Şaptirîk çi dikî?

-Ez mêşe bi carekêva tînim, çî, hûn rojê piştîkî tînin, ezê gişkî rakim, bînim, bira ardûvantîya me êdî ev car be.

Dêw lavaya dikin, xwe davêjine dest- pêya, nahêlin, Şaptirîk divine mal.

Rojekêjî dêw şewra xwe dikin, wekî Şaptirîk bikujin, yanî- na, "belkî hêrsa wî hat, wê dêwa gişka bikuj".

Şaptirîk bi şewra wan dihese. Êvarê çaxê dikeve nav cî û paşê çelekê bin cîda vedide, dikevê, kotîkekî jî, şûna xwe dike nav cî.

Wexta dêw pê şûra li kotîk dixin, ew jî bin cîda dike ire- ir, carna jî divêje:- mîratê mêşa nahêlin meriv razê.

Paşê jî hinekî xwe ker dike, dêw dibêjin: - Êdî me kuşt, werin em bivin bavêjin. Ew hanzûka kotîk derdixe û dikeve nav cî. Çaxê dêw nivîna ji ser hildidin, ew nişkêva serê xwe bilind dike û divêje:- wa! Mîratê kêça nehiştin em paldin. Dêw dîsa xwe diqincilînine ser hev, ditirsin, lerze dikeve hestûyê wan, xwe şaş dikin.

Dîsa dêw bi hev dişêwirin, wekî "em nikarin wî bikujin" çare ewe, wekî em wî bişînin ser wê hirça nava mêşê mezin nêçîrê. Şaptirîk xwe ra dibine wêderê, xwe hinekî dûr dikevin, xwe vedişêrin unda dikin. Şaptirîk tirse- tirs dora xwe dinihêre, wana navîne. Nişkêva hirç lê derdikeve. Şaptirîk direve hildikişe ser darekê, hirç vîalî- wîalî dorê diçe- tê, Şaptirîk jî tirê hirç qamprûkê xwe davêje darê, wê darê bibire, Şaptirîk ji tirsê nişkêva xwe ji darê davêje. Bextra dikeve ser piştê hirçê, herdu guhê wê digire û dike qûre- qûr, - werin!... dêw radivin, dinihêrin ku Şaptirîk li hirçê sîyarbûyî, guhê wê jî girtîye. Dêw ji cîyê xwe radivin, tîrê hirçê dikujin, Şaptirîk qure dive.

Dêw dîsa dişêwirin divêjin: - tenê çara wî ewe em jê cihêbin.(kurd jî gerek aha bînin serê dijmin) rokê dibêjin, - bira, emê cihêbin, - na, cihê nabim, her kê hûn dixazin, ji mala min derên.

Dêw divêjin- çî dixazî hilde, para gelek ji te ra.

Şaptirîk çîqa tiştê xas: zêr, zîv, çîku heye, hildide, dide piştê dêwekî berbi mala xwe diçe.

Diçe mal- jina Şaptirîk sîtilekêda şorbê çêdike tîne ber dêw, seva xarinê. Çaxê ku dêw heskê têda dike û pif dike, Şaptirîk ji ber pifa wî bi arîka dikeve. Dêw dipirse: xûşkê birê min çima ussa dike?

Werdek divêje:- hêrsa wî hatîye, li şûrê bavê xweyî kevn digere, wekî pê te bikuje.

Dêw heskê davêje û direve.

Axê gund divîne, wekî dêw direve, gazî dike.

Dêw, çima direvî? Dêw divêje- Şaptirîk dixast min bikuje, loma. Axa divêje, Şaptirîk çî ye ku tu ji wî ditirsî? Wextekê min ussa kiribû (zartîyêda) ji tirsê rûvîya heta

êvarê ji tendûrê dernediket. Navê wî Şaptirîkê jirûvîyarevî ye. Dixazî naka jî rûvîkî hildim, hizdikî berdimê ji mal derxim.

Dêw divêje, na ez wî nas dikim.

Axa divêje, hesdikî em herin, tu şirîtekê nava minva girêde, serîkî wê bigre, der malê bisekine, ez herme hundur, Şaptirîk dike- qûre- qûr. Dêw jî tirê Şaptirîk axê dikuje, dêw çirp banzdide, axa li vî kevirî- wî kevirî dikeve, dimre.

Paşê dêw dizivire ser meytê wî, divîne ku axa mirîye divêje, - himi... lê te digot ezê ji mal derxim, Şaptirîk ji rûvîya newêre, te dî, çewa tu kirî zend...

Ew meselê ku bavê min digot, zef xweşa min dihatin, min jê hisdikir. Paşê sive ron dibû, min ew gilîyê bavê xwe diwekilandin, ku hevalêd xwera digotin ew li xweşa wan jî dihatin. Hero dihatine cem min bi min didane gotinê. Carna jî wana gilîyê ussa pêkenî digotin, me ussa jî rojê xwe pê derbaz dikirin.

Wexta ku bavê min ji xebata çetin dihat, min pêşîra wî digirt. Ew pêşîr girtin, minra bûbû edet. Bavê min jî ez dikirme hemêza xwe, û derheq gilî gotinê ku li oda Qasim begê dihatine gotinê digot. Carna jî derheq lihevketina dinê. Şerê li Êrsête ji me ra digot. Dinê tevhev bûbû, talanbû, kuştinbû, me hero gilîyê teze dibihîstin.

Ji alîyê stansîya Arazdeyenêda Taşnakê alîyê Filistanê esker girêdabûn, dihatine ser nehya Noreşînê, Mûsafatîst, axa û begê Şerûrê jî, komê esker çêdikirin dişandine pêşîya wan. Ew komê ku diçûne pêşîya Taşnaka, hemû jî kesîbê li ber desta ku bideştî Musafatîsta zarê xwe hizkirî hiştibûn, diçûne ber gulla.

Sînorê Taşnaka û Mûsafatîstê Şerûrê, berê bûbûn Qereburun, lê paşê taşnaka ew ji wê dane rakirinê, tijî gundê sederekê bûn. Hema ussa erebebûn ku ji gundê sederekê berbi şer ve dihatin, hema ussa kuştî û birîndar bûn ji nav şer şûnda dihatine" dîtina " malê xwe. Hemîn ku talanê gundê Sederekê zûda çûbû, gelek xanî jî hatibûne şewtandinê. Lê nêta Taşnaka ew bû, ku Şerûrê jî destbînin.

Seva wê jî hatibûn, li çîyayê Dehnê û yê Demirçîyê sekinîbûn û ew rê girtibûn. Her şev, ji nîşev şûnda, taşnaka hucûmî ser gundê Demirçîyê dikir, dibû şerê wan û dîsa şûnda dizivirîn li cîyê xwe disekinîn.

Gundda êdî razan tunebû. Jin- zar êvarê hetanî sivê pişt girêdayî li ber agira rûdiniştin. Robi- ro jimara eskerê Musafatîsta kêmbû(milletçîyê Şerûrê) eskerê teze lazim dibû. Qasim beg harbûbû, ketibû nava gunda merî bi zorê ji mala

derdixistin, dişande pêşîya şêr. Her cîyê ku berê xwe ji firona şêr diguhêrî, li ser şuara(lozpnga) " her cîyê ne ji xîretê, ne ji ometêye " dikuştin, malê wî jî talan dikirin. Bavê min jî şandibû. Pey çûna bavê min ra, êdî xelqê karê xwe revê dikir, wê birevîyana. Fişeng kuta bûbûn, hucûm zûzû dibûn, meyt û brîndar pey hev dikişîyan ji firona şêr ber bi gunda dihatin, hemînkû yê nolî bavê mine bêxwey jî cinyazê wan nav dest- pêyada li ber tava orta havînê û payîzê diman.

Hucûma miletçîyê Filaye paşin bû, êdî dengê topa, bere- bere nêzîk dibûn, berekêva berbi me dihatin. Meriv zû- zû ji şêr dihatin, hêwirze ketibû nava gunda. Hine mal jî(dewletî) dizîkava revîbûn, seyê wane mayî nav gundda dikirine kûze- kûz. Hineka jî erebe teze bardikirin, zar- jinê xwe didane ser û bi dilekî kul, ji gund derdiketin. Qasim begê jî alîkî destê sîyar dabû ser xwe û ketibû nava gunda, her cîyê ku teze ji şêr revîbûn, hatibûne malê xwe dîsa dibir û digot- ha, xalçê- bavçê îro roja xîretê ye "ha.Ewê bona çî bikirana şêr, ew nedigot. Carna jî erebê barkirî vala dikire erdê, ga dibirin seva goştîyê " egîtê xwe " Eskerê miletçîyê fila ketibû fêza gund, alîkî dengê topa, gula, alîyê dine jî dengê qûre- qûra jin zara lerze kiribû wandera. Ereba, koça dabû pey hev, ji gund derdiketin, direvîyan, eskerê Taşnaka jî pêda- pêda gund dişewitandin û pêşda dihatin.

Hemîn ku serberatê bavê min tunebûn, min dêya xwe jî unda kiribû, û ragorî koça ketibûm, diçûm. Heta me lingek diavît, gumana anîna lingê dine kesî nedikir. Axiryê koç jî hiştin, tenê ketibûn haya serê xwe, ew jî tune bû. Hema ussa jî meriv bûn, diketin, radibûn, hineka jî qe rabûna wan tunebû. Bi wî halî, ussa bi rev- bezê em çûne ber pira Şahtextê. Li wê derê mexlûqet ussa zef bû, ku ji zêwe- zêwa wan kesî nizanbû kî çî dibêje. Hinek ser pirêra, hinek bi lotka derbaz dibûn û hinek jî xwe davîtine Erez, têda silsil digirtin, roda diçûn, tev avê dibûn û berjêr dikişîyan. Gello wî çaxî çima kesek ber wan nediket? Lê çima dest nedivîtinê, dervedixistin? Herkesekî haya xweda bû. Malê beg, xan, axalera zûda derbaz bûbûn, çûbûn wî alî çadir vegirtibûn, mêrê wan zivirîbûn, wekî pêz, dêwêr derbazkin. Wekî merîkî xwe nav pez- dewarê wanra dikir, ku derbaz be, hema li orta pirê bi gula lêdixistin, davîtine çemê Erez, roda diçûn. Me gelekî dixast, wekî em bibûna teyr, bifiryana heta nav çadirê wan, lê nedibû. Me xwe davît, em nav çemê Erez bê însafda roda diçûn. Min xwe nav pezê Qasim begêra kir, ketime binzîkê wîda hêdî çûm û derbazî wî alî bûm. Paşê min dêya xwe nav Erezda dît, wekî carna bin tavê diket, carna jî serê wê derdiket, dikire gazî û disa unda dibû. Xelqê mayîn jî, her çîyê hatibû kuştinê, roda çûbû, ew çûn, yê mayîn jî derbaz bûn, hatine welatê Îranê. Li

wêderê jî bela bûn, herek çû cîkî: hinek çûne Tewrêzê, hinek Têhranê ez jî bi destekêra li ber dîwara stûyê xwe xar dikir tî û birçî rûdiniştim, şev jî li ber dîwara ji dest qizqanck û mera xewa me nedihat, carna jî nanoziko ji malara dixebitîm heta êvarê. Lê idî kê seva xweyîkirina min tewla mala Qasim begêda bixebitîya heq bistanda ez bi ezîzî xweyî kirama? Hellbet kes tunebû gerekê êdî ez bi xwe bixebitîyama, min bi xwe, xwe xweyî bikira. Qasim begê zêr derxistibûn hûr dikir, dîsa dikan danîbû, xebatçî didane xebatê. Lê ez nedidam xebatê, guhdarîya min nedikir, berî min dida, ez ji mal derdixistim.

Min ji wê berê xwe da pişta Girîdaxê, çûme nav êla Celalîya. Li wêderê da pişta gelek êl û qebîle hebûn. Xelka, Dilxêra, Redka, Bilxika Şemka , û yê mayîn... aXê wê êla girane mezin, Xalidê Evdal aXa bû. Çend birayê Xalidê dine jî hebûn, ew jî dewletî, xudanê kerî- sûrîya bûn, ew jî mîna Xalid bi talançîyara par bûn xênji nav talana heywanê rind, tiştê baş ser parî hildidan, her yekî jî çend tivingê xwe bi şirîkayî dabûne yê kesîbe bêtiving. Welatê Îranê, pişta Girîdaxê gelek quçikê kevirê bidest berevkiî hebûn, hemû yê ku bidestî aXa- bega talan anîbûn, hatibûne kuştin, kuştibûn yan jî li ser paravekirina talana xwe- xwe hev kuştibûn ser xûna wana kevir dabûne ser hev kiribûne quçik.

Gerekê bêjim, wekî angora edetê wêderê, êvara cahil diçûne dizîyê, ji vê obê derbazî oba din dibûn, heta sibê hêke- hêka kêşikvana û ewte- ewta sa bû, bi gulla bere diza didan, carna jî dikuştin, yan digirtin, wext jî diqewimî kêşikvan dihatine kuştin. Ji wê jî orta wanda dijminayî kê m nedibû, çend roja carekê dîsa dibû şerê wan, talanê hev dikişandin, mêr ji hev dikuştin, helbet ew jî bona nav- dengê axa û begêd wan bû, bona kesîba tiştê jî tunebû, qe li ser qoçaxîya kesîbek jî kilam- qayde nedihatine gotinê, hemû li ser navê axa- bega... wan rojê oxilma da kesekî derheqa jinêd cane canebîbûyî, zarêd hûre êtîmmayî, canê kuştîda tu tişt nedipirsîn. Nedigotin, tenê dipirsîn Êla kîjan axayî ya kê alt kirîye? Wekî li ser navê wî qaydê teze (kilam) derkevin. Li wêder hebûn hesav nedibû çewa ku ya xweyî bixwe, çimku hinek dihate dizînê, hinek talan diçû. Seva wê jî gerekê şivan gavan û berxvan merivê canbêzar bûna, heta nehatana kuştin, talan nedana kesekî. Hemîn ku kîjan mal yan jî kîjan êl, bihata zozana Zozanrûtkê, çend hesp, çend ga neşandana der mala Xalid axa û bira, ewê talankirî, xwe jî kuştibûn. Yek jî ew edetê 7000 sal pêşda berî xwendinê, bi darika, tişta hev serwext dikirin, min nav wê êlêda dît, wekî dijminaya yekî yê dinêra heve, lê nexaze bikuje, şev diçe patroneke tijî datîne ber serê wî. Ew elametîye, wekî dijminê wî îşev karibûye

bikuje, her tiştî bîne sêrî, lê nekirîye. Emrê axa û begê wê derê bi şayî, li sîngê çîya, nav kulîlkê reng- rengî , avê belekîya, hewa hênik û temizda, bi govendê qîz bûka derbaz dibû. Xarina wan qelî û goştê berxa bû. Qîz- bûkê xemilandî diketin destê hev, berê "sêpêkê, koçerî" carna jî zû- zû weldigerandine qaydê"Romanî " û carna jî nişkêva çirtik didane xwe, hildikirine qaydêd " Tenzere" "Dolavê" "Baso" "Kalemêr "û yê din, qaydê " Salhîsulhî" dikirine ya lape paşîn. Li wêderê, angora edetê cî, qîz, bûk hebûn ku stûyê wanda torê morî mircanê reng- rengî, zendê wanda bazin û rêzê morîya, guhê wanda guharê zêr zîv, pozê wan bêfila alîyê rastêda qerefilê zêrîn bû, hemîn ku serî ji perêd zêr- zîv xemilandî, bendê piştê wana rêzê, perê zîvînê durûyî bûn. Lê qîz, bûk jî hebûn, wekî bi kincê peritî, hesreta wan torê morîyê qul bûn, dihatine govendê, wêderê detsê xwe ber heva dikirin disekinîn. Eşqa wan tunebû, wekî biketana govendê, çimku govendêda gerekê bi destê pêşê xwe peritî bianîyana hev, bi destekî jî govend nedibû, angora edetê wêderê qîz, bûk nediketine destê xortêd xerîb, lê şêx, mele û beg, xerîb hesav nedibûn. Lê gerekê bêjim, wekî ew govend pêşê wanî hero bû. Li çolê jî dengê Tulum û bilûrê şivana dihatin wekî hinek hilkişîyabûne ser zinara qaydê cure- cure lêdixistin. Min muqdarêkî nav wanda ebûrkir, paşê min ewder hişt û dîsa berê xwe da xanîyê bavê xwe û hatim, her kevir, av, dar, çîya hebûn, tenê dê û bavê min tune bûn. Xelazbûna sala 1919- a bû, nehya Şerûrêda hela zabitê Musafatîsta serkarî dikirin. Hatina Bolşêvîka bi waneyan bûbû, cimaet berev dikirin, navda gilî- gotinê cûre- cûre digotin, didane serwextkirinê wekî cimaet Bolşêvîka raçev dikir, çimku wana derheqa Bolşêvîk zûda bihîstibûn, yek jî wana zanibû, wekî Bolşêvîk(zûda) bên, êdî axa- begê Şerûrê wê nikaribin wana bizêrînin. Sala 1920- a Eskerê Mûsafatîsta alt dibûn. Bolşêvîk, nav gundada Rêvkom(sedrê Şêwra gund) kifş dikirin. Ez jî bûme Rêvkomê gundê me.

Li nehya Şerûrê her dera, her gundada, dîwana şêwrê hate teşkîlkirinê, dengê axa bere- bere kêmbûn, navê wan diket,, ji wêjî ji wana gelek direvîyane serê çîya, dibûne qaçax, komê wan çêdibûn. Komêd qaçaxa gundê çîya, nava mêşada diman, wana şev ser gundada digirtin, merivê xebatçî, yê firqevan dikuştin, malê wan talan dikirin, yê gundîyê dine jî çî tiştê wanê pak hebûn, dibirin. Beg, axa ku ji nehya direvîn, diçûn digihîştine wan, qeweta wan robozêde dibû, komê wan zef dibûn, wana diha ew rê û dirb girtibûn, nedihîştin kes bê- here, merivê şêlandî birîndar û cinyazê kuştîya bûn, wekî ji jorda hero dihatin. Ez wan rojê paşîn ji sedirtîya gund hildabûme nav alayê. Alaya me berbi Şûşûqelê rêket, rêya me

gerekê Ese gundê Qulîdûzê keta, koma wan bela bikira, pêsîra gundîyê xebatkar ji wan xilaz kira, ew rê vekirana. Alayî berî êvarê rêket, tarîyê erd hildabû, gund ketibûne bintarîyê, kesek derva tunebû. Tenê dengê ewte- ewta seyê gunda , fite- fîta şivana bû. Xuşe- xuşa ava çemê Arpeçayê bû, dikişîya tev ava Erez dibû, berjêr diçû. Alayî bi fesal diçû, nava gêlî, ber çêm, nav darara derbaz dibû. Wê rojê li cîkî ber çêm êwirîn, rihet bûn. Roja paşîn dîsa êvarê Alayî rêket berbi dijmin, wê şevê êdî komek eskerê sor(12 esker) kivş kiribûn, wekî pêşîya herin, seva dîtina cîyê dijmin, seva beledîya rê û serwextîyê. Sive ronbû, Eskerê Sor kom- kom diçûn, ji eskerê sorê kivşdar, nişkêva yek tele- tel zivirî gihîşte bal emirdar, guhê wîda çend gilî gotin. Emirdar esker cîda da sekinandinê, gazî çend kamandêra kir, şêwreke çûk kirin, paşê emir kir, wekî pêşda û komek eskerê din jî pey wan kivşdara şandin, wekî dordarê (qerawilê) dijmin bê deng, cîda bigrin. Serkarê wê koma kivşdar, Andirêy bû, Andirêy xortekî cêribandî, simêleke zere lê, çevê kesk, rûyê xwe nivîda kur dikir, cênik dihişt, dordarê dijmin li ser qeyê rûniştibû, tava sivêda sê heva pale xwe sipartibû kevira razabûn, dudu jî li ser tehtekî Tame dilîstin, car- carna jî bawîşkê xewê dihatinê dihênijîn.

Andirêy emir ser hevalê xwe kiribû, wekî teletel pey wî herin yek jî sipartibû wan, wekî bê kuxuk , ussa rê herin ku neve xişe- xişa çirpîyê mêşe û reqîn bi kevira nekeve, ji bin lingê wan kevir hol nevin. Andirêy pêşîyê diçû, esker jî nolî wî çelepîka pey diçûn gihîştine bintara qeyê, Andirêy çend esker li jêrê, hemberî wan, da sekinandin, wana tiving bi qerewîlara girtin, bi xwe û çend hevalava jî dizîkava qeyêra hilkişîyan, wan hew nihêrîn, bi şûrê tezîkirî serra sekinîn! Werne rayê! Destê xwe bilindkin!

Ewana hatine rayê û sipîçolkî bûn, Andirêy destê wan girêdan, çek sîlhê wan hildan, berbi alayê anîn û elam kirin wekî alayî pêşda bê. Eskerê Taşnaka bintara Qulîdûzê fêza gêlî nav mêşeda cîkî rast ber kanîyê êwirî bûn. Darê mêşe zef hûr, hinek jî kolê Mêwka bûn. Ser darara piştta hespa û serê meriva dixwênyan. Dûyê agira ji dûrva xuya dikir, kivşbû, wekî xarin hazir dikirin. Eskerê wan hinek pêxas velezîya bûn, hineka xarin çêdikirin, hineka jî ser kanîyê lingê xwe dişûştin, tivingê xwe temiz dikirin, pêra jî kom- kom kilam digotin, laqirdî dikirin. Serkarê wan jî kulav û xalîçe ku ji gunda talan anî raxistibûne erdê, ser velezîyabûn şerav bi kibab û qelîya berxa dixarin.

Alaya me çê nav darara hat, weke nîv kîlomêtrekê nêzîk çar alîyê wan girt, û qeleçe vedan, cîyê xwe dîtin Karpov nişkêva elmetîya rayê da, wekî bêne rayê! Eskerê wan tevhev bû, hineka sol- gorê xwe hîştin, hineka kum, hineka jî hesp zîn, dest bi revê kirin, xwe nav darara dikirin, lap xwe unda kirin. Paşê serkarê wan emr kir: - nerevin! ... lêxin...agirkin! Eskerê wan hela ser hevda nehatibû, cîyê hev nizanibûn, herekê tanga xwe da devê tivinga xwe dirêj kir, - pûlêmyota agirkin ! paşê emir kir wekî bera desta Andirêy pêşda herre, bomba bavêje. Bû gure- gura pûlêmyota, bomb ser hev davîtin. Eskerê wan him direvî, him diketin, nav tozêda, gullada xwe unda kiribûn, diçûn nêzîkî. Koma eskerê me dinê dibûn, û dîsa şûnda dizivîrîn. Wê ortêda weke 60 neferî devê tivinga bilind kirin, û berbi me hatin. Ji yê mayîn destekê ji hev şidand û hucûmî ser eskerê meyî pêşberî xwe kirin, eskerê me hinekî mîna xwe şaş kir, hineka jî dixast şûnda vekişin, lê Karpov dîsa emir kir, - pêşda ! xwe jî pêşda gav da, esker dîsa lê zivîrî, vê carê îdî wana teyax neda , revîn. Dest bilind kirîya tu ji xwe çê nekir, tev wî şerî nebûn. Me eskerê wan yê ku girtin, yê dinê jî kuştin , yê ku direvîn jî eskerê mey dûrsekinî, yeko- yeko digirtin, digîhandine hev, dianîn tevî girtîya dikirin.

Paşê firgon nêzîk dibûn, eskerê sor tivingê berevkişî, dikirne firgona, dibirne gund, hespê wan û jê mayînê din hemû berevî cîkî kirin. Ji wan êpêce meriv hatibûne kuştin, birîndar kirinê, dibû nale- nala wan hineka, ji êşa birîna xwe erdê bor dikirin, gazî dikirin, av dixastin,- av-... av-... ew kuştî û birîndar hemû jî dijminê sinifa prolêtara bûn : xan, serkar û zabitê wan bûn. Yê gulla pûlêmyotê qalpaxê sêrî birî, sereskerê wan bû.

Piştî çend roja alaya me ji wê berbi Şûşûqelê çû. Nava mêşa, qeyê zinarara derbaz dibû. Ji nav mêşa û qeya gelek heywanê beyanî radibûn : hirç, rûvî, gur, pezkûvî, û yê mayîn... ew hemû jî yê me dîtîbûn...

Em çûn, li Şûşûqelê eskerê me gihîşte hev û me xebatçiyê Qerebaxê jî bi serkarîya firqa kommûnîsta azakirin, niha jî ez nav Ordîya Sor da alayî komandanim û pêşîya dijmina şer dikim.

Xebata Dewrêş

Dewrêş xortekî delalî berbiçev bû. Bejna Dewrêş, mîna dara sipîndarê raste tîtalî bû. Dewrêş hela 20 salî, sifetê wî mîna şiklê ji mûmê çêkirî sipî û nerm bû û rûyê wî nehatibûn. Wexta Dewrêş kincê xwe li xwe dikir, serê xwe şe dikir, merya

hewes nedikir, berê xwe jê biguhesta. Porê wî reşî kurîşk, tilyê wî mûmanî, çevê wî mîna asê dor neqîşandî, buryê wî reşbûn.

Dewrêş di nva gundê Têcirlîyêda dihate hesavê çewa xortekî ji bedewa, bedew, derbdar, mêrxasa mêrxaş û ji hazirbûnê hazir. Dewrêş wê payîzê teze mekteba eskerîyê kutta kiribû, çewa firqevan şandibûne gundê Şûşê uzeka firqê.

Gundîya ussa ji Dewrêş hiz dikirin, digotin, kelemê ku wê lingê Dewrêşra here, bira çevê me ra here. Hemîn ku qîzê welêt liser wî aqilê xwe unda kiribûn. Lê wexta Dewrêş di civatada, xebirdida ? merya tirê eynî kitêbê bedewetiyê girtîye destê xwe dixûne, ussa zû- zû û pirs li hev dianî , û bi devlêvê xwe şekirî beşer vedibû dikenya.

Wexta Dewrêş seva qedandina pilana xwendinê gundî berav dikir û civat dikirin, gundî bizimanekî nerm û bi pirsine kûre ussa dida serwextkirinê gelleka hema li wêderê digotin- ax! Dewrêş xwezila tu birayê me, yan tişteki me bûyayî ! bira kirasê sercanê me hesret bîya, hineka jî digot- ji wî ra sedirtîya nehyê lazime, çewa bûye, wekî ew şandine serkarê gundekî, Dewrêş, ussa bû, wekî serkartîya gundekî mîna gundê Şûşê jêra hindik dihate hesavkirinê.

Çimku ewî bi wê xeverdana xwe û xevata xweva, hemû pilanê gund : pilana çandinê, xwendina borclî û yê mayîn wextêda didane qedandinê.

Ussa ji bin destê uzeka komsomlada , teşkîlatê cûre- cûre dibûne teşkîlkirinê : mopêr, aso avyanîm xaçê sor, û yê mayîn Dewrêş sipartibû hemû firqevan û komsomolêd gund, seva hînbûna şuxulê eskerîyê, seyasetê û şuxulê doxtirtîyê hînbîn.

Dewrêş 7 roja carekê firqevan û komsomolê gund berev dikirin, wanara dersa gulle agirkirinê, seyasetê û doxtirtîyê derbaz dibû.

Wexta gundîya didîtin Dewrêş wana dide cêrgê, hînî lêxistina nîşanê û şuxulê mayîn dike, hema wî çaxî digotin : oro, welleh dîwana dîwaneke zore, her komsomol, firqeçî û xevatkara hema di malê wanda jî her tiştî dide hînkirinê.

Lê wexta gundîya nîşanê wane derbdartîyê , fîzkûltûrê û gulle agirkirinê didîtin ? kal pîra jî xwezila xwe bi wan dianîn dixastin bibûyana tevî teşkîlatêd wan.

Herro wî çaxî, qîza kesîbê gund, Ûsivê Evdo û çend qîzê dinê 14-15 salî dihatin temaşe dikirin. Lê lap nedihatine nav wana, tenê dûrva mêze dikirin.

Seyrana qîza Ûsiv, hevala xwe Gulîzerê ra digot, lêlê çima nayê, em jî bivine tevî wan.

-ez jî dixazim- Gulîzer got.

-de were em herine, bal Dewrêş, erzê binivîsinin bidinê

-ne ez ditirsim.

-ji çi ditirsî?

-şêx Şero û melle Îsa her- ro têne mala me, bavê minra divêjin :- neve- neve, tu dihêlî qîza te here bive komsomol. Bavê min êdî têda muteheyir ma got :- na, tiştê usa dive ? ez nahêlim. Îja naka wekî ez bêm, tu were, seva wana dilê bavê min neyêşe û nehêle.

Gulîzer can ! were em çend roja dizî herin civata û ji Dewrêşra jî bêjin, ewê esse dê û bavê me bide serwextkirinê, çimku xeberdana usada şêx melle nikarin ber wî xeberdin.

Seyranê digot û millê wê digirt, berbi wana dibir. Berê Gulîzerê hinekî xwexwe şûnda digirt, paşê hema nişkêva got:

-De were em herin! Helbet komeke nolî wan û xortekî nolî Dewrêş wê li piştta mevin. Şêx Qeroyê rûdirêj û melle Îsayê piştakuz, wê çi bikin.

Î... bera teze kete bîra min, ne Eyşana Sebrî jî çû xwe nivîsî komsomol kete nav uzekê, naka jî bîye serkara mala xwendinê.

Çi bi wêya kirin, wekî çi ji me bikin, were em herin. Lê çewa? Merivê ku bixwaze pêşda here, bive meriv, ji dinê tişteki hilde, gerekê netirse, şerm neke, ber çetinîya nesekine, hela ku niha tu çetinîyê ussa tunenin, ne? were em herin. Seyranê got û destê hev girtin, Kenyan, berbi wana çûn, dûz çûne bal Dewrêş. Dema Dewrêş ewana dîtin, - oh!... ser sera û ser çeva hatine, gelî hevalê delal, yeqîn hûn hatine wekî tev me bixevitin erê?

-Belê... lê Dewrêş can! Gerekê tu ussa bikî hela kes pê nizanbe, û paşê jî dê û bavê me serwext bikî, Seyranê got.

-Ew gilî ser sera – ser çeva, lê hûn hela du sê roja werine civatê, hûnê bi xwe gilî-gotinê usa hînbîn, wekî qe kesek nikarve ber we xeberde, got û hanzûka jêra erze nivîsî, ankêt tijî kir û da uzeka komsomola. Çend roja derbaz bûn, Seyran û Gulîzer

qe ji civata nediman, heta roja civatê, ewana êpêce hînî gilî- gotinê seyasetîyê û teze jî bûn.

Wexta ewana derbazî nav komsomolîyê dikirin, Eloyê komsomol rabû got, - gelî hevala! Hûn xwendinê zanin? Hûn zanin wekî komsomolî çîye?

Ji wana, Seyran rabû got, - Erê, here kê m sê sala mekteba gundda xwendîye, komsomolî jî, teşkîlateke komeka (umûda) firqê ye. Cav da û rûnişt. Hevala yek- yek pirs dan- ewana jî êciznebûyî cav didan. Paşê bidestbilindkirineke bê miqabilî ketine nav komsomoltîyê. Êdî hersê qîza jî kincê komsomolîka li xwe, kiribûn, tevî uzeka komsomola bi dil û eşq dixevitîn.

Xortê gund gelleka seva Seyranê aqilê xwe unda kiribûn û sevê dîn- harbûn. Çimku Seyran aqilê xwe, xevata xwe û him jî bedewiya xwe zef zêde bû. Seyranê ussa bû, lê xorta wê çewa aqilê xwe unda nekirana? Carna wextê besa mêrkirina wê dibû, Seyranê digot, - ez mêr nakim, heta xwendinê dest neynim. Lê dê û bavê wê dixastin hema wê gavê jêra mêrek bidîtana û bidanê. Çimku wana nedixast, wekî qîza wan here cîyê dût û xerîb keve. Digotin, bira qîza me gundda mêr ke, ji me neqete. lema jî Seyrana belengaz bi Emoyê kurê – Elora gotin kirinbûn, wekî bidanê.

Seyranê, Emo begem nedikir, û nedxast, çimku ewê Emo zûda nasdikir, ne xwendî, ji gilî- gotinê şêwrê paşdamayî, şivlibinguhketî bû.

Lemajî Seyranê dezmala wî şûnda dizivirand û soz nedida, seva standina wî. Mena Seyranê tenê bûbû ew, wekî dê û bavê wê jê nexeydin, dilê xwe nekin, digot, - ez seva xwendinê nastînim. Çimku ez diçime xwendinê. Seyranê dest wanda debar nedikir, dixastin, wekî bi destê zorê bidinê, ewê kerî şivliguhketî. Seyranê Êdî dît, bêfeyde ye, got, - hemîn ku ezê biçûyama, hema ya pak ewe, nakava herim, rabû, çû bal Dewrêş, got, - ez dixazim, herim bixûnim.

Dewrêş, got:- kêderê û kîjan mektebê?

-Bakûyê, yan jî Rewanê têxnîkûmê çima wê min hilnedin? Seyranê got.

-Wê te hildin, xevata xweda derbdar, û bi texmîna min gerekê te di gundda kursa çara kuta kirive, erê?

Belê.

Seyran can! Wekî diçî xûşka min Eyšê jî bi xwera bibe, bira ew jî bixûne.

-Eyšê tişteki ji xwendinê zane? Seyranê got.

-Lê çewa, serkara mala xwendinê ye, ew jî mîna te komsomolkaye, him jî dersdara kursa jina ye.

-De were em îro herine nehyê şuxulê me dûz kin. Seyranê got û her du çûn, şuxul dûz kirin û vegeryane, mal.

Wexta destpêbûna sala xwendinê Seyran û Eyšê çûn, berê ketine kursa hazirîyê, paşê jî ketine kursa yekê û xwendin.

Dewrêş jî êdî nedixwest, wekî gundda bimîne, çimku Seyran û Eyšê çûbûne xwendinê, ew jî êdî bere- bere mezin dibûn, ji wî ra jî xwendina bilind lazim bû, dixwest bixûne.

Ew jî rokê rabû çû nehyê şuxul teslîm kir û çû Tîflîsê kete înstîtûta firqê, seva xwendinê. Ew êpêce wext- zeman bû, wekî mala Dewrêş xalî bûbû êdî kesekî nolî berê oda wî nedixemiland, û têda govend nedigirt, wekî xort û qîz bicivin.

Çar sal derbaz bûn, me bîhîst , wekî Dewrêş Seyran û Eyšê xwendin kuta kirine û vegeryane nehyê.

Wana şiklê nehyê tamam dabûne guhastinê, xevat dabûne ser hîmekî qewîn, ussa xevat pêşda dibirin eynî li ser gilî gotinê H. Lênîn.

Dewrêş û Seyranê zef ji hev hez dikirin.

3/8/2011

12/5/1390

Edoyê Simkoyê mikoyê elîyê dûmanê kelboyê omo xelkê kela makê

Serecem

Dil teqîya

Gundê me da

Kilama Elo

Erza

Şemê

Muhubtî

Kilama oktîyabîka

Ecêve

Pîyonêr

Çaqirbegêda

Rêwîtîya min

Dersdar şiro vedike

Berê kurê Koso, paşê Zekî

Elî û Dîlber

Ber çetinya huner

Xebata Dewrêş

